
# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ — SAL: 1 HEJMAR: 18 — 19 ADAR 1995 — BUHA:25.000 TL(KDVD)

## HEFTIYEK BERIYA CEJNA NEWROZÊ BI BEREKÊN POLÎSAN ZÊDEYÎ 30 KES HATIN KUŞTIN, 200 KES JÎ BIRÎNDAR BÛN

# NEWROZÊ LI STENBOLÊ ZÛ DEST PÊ KIR

● Li Stenbolê li taxên ku bi giranî kurdên alewî lê dimînin, heftiya dawî di pêvajoya sê rojan de nêzîkî 35 kes hatin kuştin û 200 kes jî birîndar bûn. Bûyera ku bi gulebarankirina ser 3 qehwexaneyan û pastexaneyekê, dest pê kir. Bi êrîşên polîsan yên li hemberî meşên gel, pêl da gelek bajar û navçeyên din. Gelê ku li navçeya Gazîosmanpaşayê li taxa bûyerê dijî, di vê êrîşê de dewletê û hêzên wê yên emniyetê sûcdar dikin.

● Çapemeniya tirk bûyer û pêşveçûnan li gorî talîmatên generalan dan. Di pêvajoya qewimîna bûyeran de, hemû kanalên televizyonan û rojnameyên tirk bi zimanekî û dengekî yekser nûçe dan û çi sûc heye li girseya gel kirin, polîs temîz nîşan dan. Serhildana gelê kurdên alewî hizûr ji rayedarên dewletê re nehişt, rayedaran hev û din sûcdar kirin û mesûl girtin ji bo tiştekî wisa.

Rûpel 2



Ebûqeta rojnameya me Eren Keskin jî dikeve hepsê, çunkî;

## 'DINYA JI GELÊ KURD RE DEYNDAR E'

● Eger li ser pêvajoya 70 salên dawî ya dîroka Komara Tirkiyeyê bête rawestîn, wê bête dîtin ku hîna PKK tunebû jî pesta dewletê li ser kurdan hebû.

● Dema ku Şêx Seîd, Seyîd Riza û rewşenbîrên kurd hatine dardekirin, dema ku di 1938'an de Dêrsim hate şewitandin, hilweşandin, bi hezaran mirov hatin qetilkirin...

Rûpel 8–9

## Divê ziman zûtir di nav gel de bi cih bibe

Zimanê neteweyî divê zûtir û hêsantir di nava gel de bi cih bibe. Heke em rêzimanê zaravayê xwe yê ji hêla piraniya gelê me ve tê zanîn û pê tê axaftin bingeh bigirin, ew dê hînbûna zimanê neteweyî hêsantir bibe. Piraniya kurdan bi kurmancî zanin û pê qise dikin.

Rûpel 11

## Qîrnayişê azadiyey

Ma heme zanê ki Afrîka ya Başûr heta yew di serrî ra ver mêrdimî siyay welattê xwi di azadî nêbî. Mêrdim andê sipî ya, hinzar yew eziyet, hinzar yew îskence kerdênê jîn. Çik zengîneya welattê jîn (siyaya) bi pêro sipiya destibê... Eses wayîrê ayê herra zî xwi rê kerdîbî kole...

Rûpel 13

## Baba Tahîrî Hemedanî

Sereray ewey ke mêjûy jiyanî Baba Tahîr zor tarîk e û ta êstaş zor layenî be şaraweyî mawetewe û natwanrê wekû pêwist derbarey ew şaîre gewreye qise bikrêt. Belam ewey ke sax botewe û cêgey gûman niye ewe ye, ke Baba Tahîr kurd e û be şêwey lûrî helbestî nûsîwe, lûrîş lehceyekî belgenewîstî zimanî kurdî ye û le zor serçawey mêjûyî da eme selmêndirawe.

Rûpel 7

## Qelbî Mezopotamya..

1872 di xebatê arkeologan bi dinya lîteraturêko newi da sinasnayiş. Namê lîteraturê ku heyecan viraştibi "destanê Gilgamiş" bî. No destan derheqî mîrî bajarî Uruk di bî. Bajarî Uruk binatê çemanî Ferad û Dîcle, ku ca Mezopotamya yena variş, di amibi avakerdiş.

Rûpel 12

www.arsivakurdi.org

HEFTIYA DAWÎ DI PÊVAJOYA SÊ ROJAN DE LI GAZÎOSMANPAŞA Û UMRANIYEYÊ LI DORA 35 KESÊN WELATPARÊZ HATIN QETILKIRIN

# NEWROZ ZÛ HAT STENBOLÊ

**Tesîra bûyeran her diçe pêl dide û hêrsa gel li hemberî dewletê zêde dibe. Rayedarên dewletê, ji aliyekî ve çavên gel bi hatina derbeyeke muhtemel ditirsînin, ji aliyekî ve jî hevûdin sûcdar dikin di van bûyeran de.**

Di heftiya dawî de bi êrîşên kesên faşîst û gulebarankirinên hêzên dewletê nêzîkî 35 kes mirin, 200 kes birîndar bûn, 300 kes jî ketin binçav. Bûyerên ku bi gulebarankirina 3 qehwexane û pastexaneyeke li Gazîosmanpaşayê dest pê kirin, di pêvajoya 4 rojan de taxên din ên Stenbolê û li bajarên din belav bûn. Reaksiyonên ku gel li hemberî êrîşên polîsan bilind bûn, rayedarên dewletê xistin rewşên dijwar. Ev gelê ku deng û his jê dernediket, ji nişka ve rojên arîfeyên şoreşan anîn bîra gelek kesan. Li hemberî vê yekê, dewletê hemû hêzên xwe xistin alarmê.

Hefiya çûyî bûyerên ku li Gazîosmanpaşayê rû dan, di demeke kin de ji bin kontrola dewletê derketin û bi deh hezaran mirov derxistin sikak û kolanan. Bûyeran şeva 12'ê adarê li taxên navçeya Gazîosmanpaşa, taxa Gazî û Küçükköy dest pê kirin. Pêşî 3 qehwe û pastexaneyek ji aliyê kontrayan ve hatin gulebarankirin. Di vê êrîşê de kalekî 65 salî hate kuştin û şiferê erebeya ku kontra pê reviyan ji aliyê eynî kesan ve bi kêran hate kuştin. Bi dehan kes jî birîndar bûn. Li ser van êrîşan li gelek taxên Gazîosmanpaşayê bi deh hezaran kesên welatparêz û demokrat derketin ser kolanan û dest bi meş û çalakiyên protestoyê kirin.

**Protesto zêde dibin**

Kesên ku meşiyan polîs sûcdar kirin û ber bi qereqolan ve meşiyan û ew protesto kirin. Roja din dîsa protestoyan dewam kir û dîsa di navbera gel û polîsan de şer derket.

**5 hezar leşker**


Pêşî gule bi ser gel ve reşandin û dû re jî yên girtin dan ber jop û pihînan. Yên li ber xwe didan, dîsa dibûn hedefa berekên polîsan. Di pozberiya pêşî de li dora 30 kesên meşvan hatin kuştin û zêdeyî 100 kesî jî birîndar bûn. Piştî vê pozberiyê hêrsa gel hîn zêdetir bû, hejmara meşvan û protestovanan ji berê jî zehftir bûn û vê yekê bi temamî çavê dewletê tirsand ji ber ku hêzên polîsan nikaribûn rewşê bixin bin kontrolê. Alîkarî ji leşkeriyê hate xwestin. 5 hezar leşker anîn li navçeya Gazîosmanpaşayê bi cih kirin, gel jî, ji xwe re barîqat çêkirin, agir pêxistin û sloganên mîna "Bimre faşîzm, polîsên faşîst, bijî biratiya gelan, doh li Sêwazê îro li Gazîosmanpaşayê, Em rê nadin faşîzmê" hatin gotin.

Protestoyên gel dotira rojê jî nesekinîn û li hin sikakan şerê bi polîs û leşkeran re jî diqewimin, pêvajoya sê rojan kesên ku barîkatên ku li dora Mala Cemê çêkirin, her tim li ber xwe didan.

Roja 14'ê adarê Walîtiya Stenbolê li Gazîosmanpaşayê derketina nava kolanan qedexe kir. Eynî roj li Enqereyê, li meydana Kizilayê meşeke mezin a protestoyê ji aliyê gel ve çêbû. Polîsan mudaxele kir. 30 kes birîndar bûn. 20 kes jî xistin binçav. Wekî din li Bûrsa, Mersîn, Manîsa, Edene, Eskîşehîr; li gelek bajarên Almanya, Îngîltere û Yewnanîstanê jî meşên protestoyên li hemberî dewleta tirk bi beşdariya girseyên gel hatin lidarxistin.

**Umraniye**

Roja 15'ê mehê li navçeyeke din a Stenbolê, li Umraniye bi hezaran kurdên elewî û welatparêzên ji gelek herêmên Kurdistanê qetlîama Gazîosmanpaşayê protesto kirin. Polîsan mudaxele kir. 5 kes mirin, 40 kes jî birîndar bûn. Li Umraniye jî barîkatên gel hatin sazkirin û sloganên radîkal hatin gotin. Li wir jî derketina nava kolanan hate qedexekirin.



**Li Gazîosmanpaşayê polîsan nehişit gel êrîşên faşîstan protesto bike.**

Çapemenî û medyaya tirk ji roja destpêkê bûyeran, heta dawiyê, dîsa wekî her car agahiyên çewt û şaş belav kirin. Tevî ku polîsan eşkere girseyên gel gulebaran dikirin, wan gel sûcdar kir û çawa ku tu sûcê polîs û hêzên din ên dewletê tune bin, weşan belav kirin.

**Bûyeran pêl dan**

Tesîra bûyeran her diçe pêl dide û hêrsa gel li hemberî dewletê zêde dibe. Rayedarên dewletê, ji aliyekî ve çavên gel bi hatina derbeyeke muhtemel ditirsînin, ji aliyekî ve jî hevûdin sûcdar dikin di van bûyeran de. Bûyerên ku heftiya dawî li Tirkiyeyê qewimîn, di gelek rojname û televizyonên biyan de hatin nirxandin û di van weşanên biyan de dewleta tirk hate sûcdarkirin.

Li ser van bûyeran, gelek rêxistinên kurd daxuyaniyên protestoyê ji rojname û ajansan re şandin.

Li hemberî meş û xwepêşdanên protestoyan tewra leşkerên tirk bi qasî ya polîsan ne sert bû. Wisa dihat xuyakirin ku leşker bi xwe jî, ji zilm û zora polîsan zêde ne xweş in.

**"Ecevîtê faşîst"**

Bûyerên ku bi giranî li Stenbolê qewimîn û pêl dan gihan gelek bajar û welatên din, tewra gel a li hemberî partiyên siyasî jî derxiste holê. Di dema bûyer qewimîn û piştî ku sekinîn de ji partiyên burjûwayan yek siyasetvanekî/e bi tenê jî nikaribû bikeve nava gel. Pêşî Ecevit xwe ceriband ku li Gazîosmanpaşayê bikeve nava refên gel da ku bi wan re bipeyive û xwe bi wan şîrîn bike. Camên erebeya wî ji aliyê gel ve hatin şikandin, bi faşîstbûnê hate sûcdarkirin û bi reverev ji nav gel reviya. Heyeta CHP'ê jî xwe ceriband, bes ew jî, eger ne ji HADEP'ê bûya, wê bihatana lînçkirin.

**Navenda Nûçeyan**




Ji rojnameya Cumhuriyetê

## JI ROJEVÊ

## 'ME EV FÎLM BERÊ JÎ DÎTIBÛ'

**"Dîsa ew tiliya xaîn, dîsa ew senaryoya tarî. Dîsa ew fîlm. Me ev fîlm berê jî dîtibû... Em careke din nakevin vê xefikê. Emê vî li fîlmî careke din seyr nekin." Roja 14'ê adarê, hemû rojnameyên tirk ev nivîs di rûpela xwe ya pêşîn de weşandin. Ev nivîs an jî talîmname rasterast ji bo çapemeniyê ji meqamekê mîna fermanekê hatibû şandin. Gotinên berpirsiyarê saziya medyaya resmî Ali Baransel jî dema 17'ê adarê di rojnameyan de derket, teyîd bû ku çapemeniya tirk bûye leşkerê sîstemê. Ali Baransel memnûniyeta xwe ji bo tewra çapemeniyê dianî zimên û spasiya xwe pêşkêş dikir. Wekî tê zanîn ew di dema cûntaya 1980'yan de şêwirmendê Kenan Evren bû.**

**Di hemû kanalên televizyonên tirk de jî eynî nivîsa talîmatê di pêşî û paşiya nûçeyan de dihate xwendin. Bi kurtî tirseke ecêb ketibû dilê dewletê, ji ber vê yekê jî, beriya her tiştî dixwest ku medya ji sedî sed pê ve bête girêdan da ku tu dengên muxelîf li hemberî qetlîaman bilind nebin.**

**Em nizanin gelo çapemeniya tirk berê ev fîlm dîtibû an jî gel êdî şiyar bûbû û haya wî ji van lîstikên osmaniyan hebû?**

## JÛJÎ

Doğan Güzel




# Li ser qetlîama Gazîosmanpaşayê kê çi got

Li ser qetlîama Gazi Osman Paşayê ji rêxistin û saziyên cur bi cur daxuyanî gihîştin destê me, ji bo ku xwendevanên me zanibin kê çi gotiye, em çend xalên girîng ji wan pêşkêş dikin.

**PKK: Emê heyfê hilînin**

Komîteya Navendî ya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) roja 13 adarê bi daxuyaniyekê ev qetlîam wekî lîstikeke nû ya osmanî, bi nav kir. Tê gotin ku ew kesên ku qetlîam kirine çi navî li xwe dikin bila bikin, dijminê şoreş û demokrasiyê ne. Daxuyanî balê dikişîne ser têkiliyên dewletê û wan rêxistinên kontra. Li gorî daxuyaniyê wekî salên berî cuntaya 1980'yan, ji ber ku dewlet bi hişyarbûna mirovê alewî hesiyaye, loma van çeteyên cînayetê dişîne ser alewiyan, bi taybetî jî alewiyên kurd. Di daxuyaniyê de tê xwestin ku mirovên alewî dev ji partî û komeleyên kemalîst berdin, ji ber ku kana hemû paşverûtiyan rejîma kemalîst bi xwe ye. Rizgariya gelê alewî bi rizgariya Kurdistanê ve tê girêdan, tê gotin ku hemû mirovên azadîxwaz pêwist e li nik gelê Kurdistanê ku ala rizgariya neteweyî bilind kiriye, cih bigirin. Di dawiya daxuyaniyê de tê gotin ku Zulfîkar di destê gerîlayan de ye û wekî ku çawa heyfa qetlîama Sêwazê hate hilanîn, wê heyfa vê qetlîamê jî bi destê wan bê hilanîn.

**ERNK'a Ewrûpayê**

ERNK'a Ewrûpayê jî li ser qetlîamê daxuyaniyek weşand. Di daxuyaniyê de dewlet wekî mesûlê qetlîamê tê binavkirin. Ew vê qetlîamê jî dişibîne qetîamên wekî Meraş, Şirnex, Lice û Cizreyê. Li ser berxwedana gelê taxa Gaziyê jî, tê gdtin ku rika gelê kurd ê ku koçber bûye, pêl daye. Daxuyanî dide zanîn ku hevkariyek di navbera kedkarên tirk û gelê kurd de ava dibe. ERNK ji gelê kurd dixwaze ku qedera xwe bi çiyayên Kurdistanê ve girê bide. ERNK, bang li kedkarên tirk dike û dixwaze ku ew bi tevgera rizgariya gelê kurd re bibin yek da ku piştî hilweşandina rejîma peyka împeryalîzmê, herdu gel li nik hev serfiraz bijîn

**Mesaja HADEP'ê**

Cîgirê Serokê Giştî yê Partiya Demokrasiyê ya Gel (HADEP) ismail Arslan protesto kir, xwest ku hêzên dewletê li hemberî hestên gel hurmetkar bin û failên qetlîamê bigirin. HADEP'a navçeya Avcılarê jî dîsa bi daxuyaniyekê bûyer protesto kir. Hate gotin ku ev kar dişibe karê rêxistinên îstixbaratê . Rayedarên HADEP'a vê navçeyê bang li gel kirin ku xwe organize bike, ji bo parastina mafên xwe.

**Yekitiya kurdan a neteweyî ava bûye**

Rêxistineke din ku li ser bûyerê daxuyanî gihande destê me Tevgera îslamî ya Kurdistanê (TÎK) bû. Di vê daxuyaniyê TÎK dibêje ku dewletê hertim ji bo parçekirina yekitiya gelê kurd cudatiya mezhebî û olî wekî hincet bi kar aniye. Ew dibêje ku tevgera azadiyê êdî yektiyeke neteweyî di navbera kurdan de ava kiriye. TÎK ji hêzên tarî yên dewletê wekî mesûlê qetlîamê bi nav dike û dibêje: " Em bang li birayên xwe yên alewî dikin û dibêjin ku dewleta kemalîst ne alewî ye, ne sunî ye."

## KURTENÛÇE...KURT

### Bîranîna Helepçeyê

Roja 16'ê adarê di dîroka Kurdistanê de rûpeleke qirêj û gemarî ye. Di vê rojê de gelê kurd 5 hezar mirovên xwe dane çekên kîmyevî. Ji ber vê yekê salvegera qirkirina Helepçeyê li gelek deveran tê protestokirin. Roja 16'ê adarê li Li HADEP'a Edenê, ji hêla jinên kurd ve pêşangeha wêneyên qirkirina Helepçe hate vekirin. Pişt re komên NÇM'ya Edenê ji bo bîranîna şehîdên Helepçeyê cihê xwe girtin. Di dawiyê de jî Koma Rewşen gelek stranên gelerî û şoreşgerî pêşkêşî beşdaran kirin. Pêşengeha wêneyên qirkirina Helepçeyê wê hefteyekê bidome. **Welatê Me / Edene**

### Nûneriya ERNK'ê li Awûsturyayê jî vebû

Nûneriya ERNK'ê li Avusturyayê vebû. Bi civîneke çapemeniyê vekirina nûneriyê hate diyarkirin û li ser armanc û rola ERNK'ê agahiyeke dorfireh hate dayîn. Vebûna nûneriya ERNK'ê li Avusturyayê di nava kurdên ku li vî welatî dijîn de bû sebebê kêyfeke bêtarîf. Li aliyê din di vekirina nûneriyê de piştgiriya çapemenî, partî û saziyên demokratîk ên Avusturyayê hate dîtin. Nûnerî bi merşa kurdî ya neteweyî 'Ey Reqîp' û coşeke mezin vebû.

### Rapora CPS'ê ya 1994'an

Rapora Komîteya Parêziya Rojnamevanan(CPS) ya 94'an hate weşandin. Tê de, tê gotin ku li Tirkiyeyê rojnamegerî dijwar e. Li gorî raporê, tirkiye di warê rojnamegerên girtî de li dinyayê di rêza yekemîn de ye. Rapor wiha dom dike: "Li ser rojname û kovaran pêkûtî û cerdên dewletê her diçe zêdetir dibe. Bi taybetî li ser weşanên muxalîf ev kirin pêk tên. Lê, ji xeynî wan weşan û rojnamegerên lîberal jî hin caran rastî kirinên bi vî rengî tên." Wek mînak, cezakirina M.Ali Birand tê nîşandan.

**Navenda Nûçeyan**

# Le Atîna rêpewanî narizayî

Rojî 15.3.1995 ziyatir le 500 Kurdistanî welatparêz amadey meşêk bûn bo narezayî derbirîn hember tevkujî dewelti Turk derheq be gelî Kurd le Stenbol û şiwênanî tir. Meş le meydanî Kanîngos ewe destî pê kird û heta berdem baliyozxaney Turkiye le Atîna dewamî kird. Beşdaran be dirêjayî meş duruşmî corbecor yan dewit, wek(diwênê Licê û Siwas, emro Stenbol, sibe?– Bijî serok APO – Kurdistan debêt be goristanî faşistan). Herweha cemawer le berdem baliyozxaney Turkiye de be ber çawî peyamnêrî dezgakanî rageyandinî Yewnanî û biyanî eyewe alay dewletî Tirk yan şewitand.



Le serewe milîtanekanî PKK alayî Turkiya desûtênin.

**Welatê Me / Atîna**

# Hacetên îşkenceyê



Serokwezîra Tirkiyeyê emirnameyeke nependî şand wezîriya karê hundirîn da ku li qereqolan hacetên îşkenceyên ji holê rakin. Di emirnameya ji 3 rûpelan pêkhatî de qala peymana Ewrûpayê ya li dijî îşkenceyê dibe. Tê de bend cih digirin;

Dema binçavkirinê divê polîs bi baldarî li gorî qanûn û qaîdeyan hereket bikin. Divê îşkence û kirinên xerab li kesên di bin çav de neyê kirin. Ji wan agahî bi metodên ewrûpî û amerîkiyan bê standin.

Hevdîtinan ebûqat û bersûcan li gorî qanûnan be. Divê hemû qereqol bên konrolkirin û hacetên ku bi kêrî kirinên nebaş tên, werin berhevkirin.

Polîs pêwist e kesên ku girtine bin çav derbasî qeydan bike. Hucre divê li gorî şertên tenduristiyê û fireh bin.

Wê di der heqê peywirdar û polîsên ku kirinên nelirê kirine, tavilê pirsiyarî çêbe.

Ji bona ku ev daxwaz bêne cih divê çavê gerînendeyên ewlehiyê û waliyan li ser van deran be û ji encamê wezîriya karê hundirîn agahdar bikin. Çillerê mehekê berê jî ji polîsan xwestibû ku bêyî îşkenceyê, li metodên nû bixebitin.

**Navenda Nûçeyan**

www.arsivakurdi.org

Navên **10** kesên ku di xaçepirsa hejmara 16'an de peyva veşarî **'Ramanwer'** dîtine û pirtûka **"Siya Evînê"** qezenc kirine:

Salih- Özgür Ülke
Batman

**Ülfiye Seyad**
**Mersin**

Abbas Kılıçarslan
Diyarbakır

**Lukman Abda**
**Almanya**

Salih Demir
Antalya

**Serdeh Bêrti**
**Diyarbakır**

M. Ali Mutlu
Malatya

**Şifa-Y.Çiçek**
**izmir**

Ali Burç
İzmir

**Yadigar Coşkun**
**Diyarbakır**

# 'Rûmeta welatekî ji yekparetiyê girîngtir e'



**Yaşar Kemal**

Turkish Daily News'a roja 16'ê adarê dide zanîn ku rojnameya amerîkî The Newyork Times'ê li ser romannîvîsê navdar Yaşar Kemal nivîsarek weşandiye. Tê gotin ku nivîskarê rojnameyê John Darnton bi Yaşar Kemal re jî axiviye. Xwediyê 36 berhemên hêja û berendamê Xelata Nobelê Yaşar Kemal ji wî re wiha dibêje: "Demokrasî rûmeta welatekî ye û li gorî dîtina min rûmeta welêt ji yekparetiyê girîngtir e."

Yaşar Kemal dibêje ku ji ber nivîsên wî der barê wî de 3 doz hatine vekirin. Ew wekî sedema dozvekirinê hevpeyvîneke xwe ya ku di kovara almanî Der Spiegel de hate weşandin û du gotarên ku tevî gotarên çend rewşenbîrên din bi navê "Azadiya Bîrûbaweriyê û Tirkiye" weki pirtûk çap bûye, nîşan dide. Li gorî gotina Kemal di du dozan de ji 2 salan heta 5 salan di doza sêyemîn de jî ji 3 salan heta 6 salan cezayê hepsê ji bo wî tê xwestin.

Nivîskarê kurd dibêje ku ewê li dijî îdiayê dozger xwe neparêze, bi tenê axaftineke wekî J'accuse ya Emile Zola* bike. Kemal wiha gotina xwe didomîne: "Dozgerê bê darizandin. Wê dem vê yekê nîşan bide. Heke ez ceza bixwim, ez efûyê qebûl nakim." Nivîskarê navdar dibêje ku ewê rapora Dewletên Yekbûyî ya Amerîkayê pêşkeşî mehkemeyê bike û Bill Clinton dawetî mehkemeyê bike.

The Newyork Times dide zanîn ku Yaşar Kemal ji ber ramanên xwe yên çepgir gelek caran hatiye girtin. Kemal li ser vê mijarê dibêje ku wî îşkence jî dîtiye. Bi awayê ku ew dibêje, îşkenceya feleqeyê li wî kirine. Kemal wekî delîl jî lingê xwe yê çepê nîşanî nivîskarê rojnameyê dide. Li gorî nûçeyê, jina Yaşar Kemal Thildayê jî biken gotiye: "Şanşê wî hebûye ku wan rojan ceyran tunebûye."

Rojname cih dide gotinên Serokkomar Süleyman Demirel jî. Demirel dibêje ku ew Yaşar Kemal nas dike û ji pirtûkên wî hez dike. Serokkomar dide zanîn ku Yaşar Kemal ji malbateke kurd e. Lê tiştên ku wî di nivîsên xwe de anîne ziman wekî bêtalîhiyekê bi nav dike.

** Nivîskarê fransiz Emile Zola di sala 1898'an de, dema Doza Dreyfus'ê bi gotareke ku navê J'accuse (ez dozdar im) lê daniye, artêşê tawandar dike.*

**SAMÎ BERBANG**

# Êrîşên li ser girtiyan nasekinin!

Li girtîgeha Bucayê 77 girtî hatin birîndarkirin. Roja 2'yê adarê hêzên dewletê êrîşî girtiyên girtîgeha Bucayê kirin. Di êrîşa leşker û gardiyanan de 77 girtî birîndar bûn.

Roja 1'ê adarê rêvebirên girtîgehê di dîwarê maltaya girtiyên siyasî de, ala tirkan daleqandine. Girtiyan ji rêvebirên zindanê hildana alê xwestine. Lê rêvebiran guh nadine daxwaza wan. Li ser vê yekê girtiyekî siyasî al ji cihê wê aniye jêr û daye gardiyanan. Gardiyan qesta çirandina alê dikin, lê girtî alê ji wan distînin û saxlem teslîmî gerînende (mudur) dikin. Piştî vê bûyerê dozger dixwaze ku îfadeya girtiyê ku al aniye jêr bistîne û soz dide ku tu êrîş li wî neyê kirin. Lê gava girtî û nûnerê girtiyan ji qawişê dertên ku biçin cem dozger, leşker û gardiyan bi dar û jopan êrîşî wan dikin û bi emrê dozger wan diavêjin hucreyê. Dawiyê jî leşker û gardiyan bi hinceta lêgerînê, êrîşî girtiyan dikin. Di qawişa de pirtûk, rojname û malzemeyên girtiyan yên cur bi cur talan dikin. Di êrîşê de 24 girtiyên jin û 53 girtiyên mêr yên siyasî tên birîndarkirin. Birînên gelek girtiyî xedar e û heta niha tu tedawî li wan nehatiye kirin.

**Navenda Nûçeyan**


Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 18'an; pirtûka **Yusuf Kaynak "Bi Kurdî Navên Mirovan"** e. Ev pirtûk ji aliyê weşanxaneya DOZ'ê ve hatiye çapkirin.
**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê binivîsînin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**




"Bi Kurdî Navên Mirovan"
**Yusuf Kaynak**

## XAÇEPIRSA BIXELAT (18)




PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6

## XAÇEPIRSA BIXELAT (16)




PEYVA VEŞARÎ → R A M A N W E R

TEVLÎHEVIYÊN LI WELATÊN AFRÎKAYÊ BERDEWAM IN

# RÊXISTINA NETEWEYÊN YEKBÛYÎ AŞTIYÊ PÊK NAYNE

Li ser navê meşandina Nizama Nû ya Dinyayê Neteweyên Yekbûyî (NY) bi pêşengiya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) giranî da ser dagirkirinên li ser navê navberdîtinê. Piştî Şerê Kendavê hêzên Neteweyên Yekbûyî ketin Somaliyê, Bosnayê, Haitiyê û gelek cihên ku lê şer heye. Xebata ku li ser navberdîtinê dihate kirin, li piraniya wan welatan têk çû. Bi taybetî Li Somaliyê hêzên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî di nav de, hêzên NY'ê derbeyên xedar ji hêzên Muhammed Farah Aidid xwarin. Roja 10'ê adara 1995'an hemû hêzên NY'ê ji Somaliyê vekişîn. Ev hêz du salan berî niha bi îdiaya ku dawiyê li şerê hundirîn bînin, ketibû vî welatî, lê îro ji bo vekişînê 2500 leşkerên Pakistanî û Banladeşî, 1800 leşkerên bahrê yên DYA'yê û 400 leşkerên îtalî li tengava Mogadîşo qereqol ava kirin. Hêzên dewletên mezin berê ji vî welatî vekişîbûn. DYA'yê piştî ku roja 3'yê kewçêra 1993'yan 18 leşkerên xwe dan der, di adara eynî salê de leşkerên kişandin. Tê gotin ku NY'ê ji bo vê operasyonê 3 milyar dolar xerc kiriye, lê tiştek bi ser nexistiy û rewşa niha ji ya berê neçêtir e.



**Hêzên Neteweyên Yekbûyî ango hêzên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li ser navê navberiyê ku derê dixwazin, wê derê dagir dikin.**

Niha aqilmendên NY'ê lê difkirin ka çima operasyona wan bi ser neketiye. Li gorî nûçeyeke kovara Newsweek'ê ku vê têkçûnê bi "serkeftin"a li Mozambîkê re dide ber hev, ji bo biserketina operasyoneke bi vî rengî ew tişt pêwist in; Pêşî divê wekî ku li Mozambîkê piştî 15 salên şerê hundirîn çêbû, lihevkirineke polîtîk li hundirê welatê ku wê NY navberîtiyê lê bike, hebe. Pişt re divê otorîteyek hebe û aliyên şer karibin gotinên xwe bînin cih. Li Somaliyê otoriteyek ango hikûmetek tunebûye, li gorî nûçeyê ji ber vê yekê xebata NY'ê negihîştiye tu encamê. Xala dawîn jî divê berî hilbijartinan hêzên çekdar, çekên xwe deynin. Tê gotin ku li Angolayê Hêzên UNITA'yê çekên xwe dananîbûn, ji lew re piştî ku di hilbijartinê de bi ser neketin, Serokê UNITA'yê Jonas Savimbi 30 hezar gerîlayên xwe ji nû ve ajotin nava şer.

Li vir tê dîtin ku her tişt bi vîna hêzên hundirîn ve girêdayî ye. Heke aştî bi destê gel çênebe, nameşe. Çavkaniyên siyasî li Somaliyê karê ku NY dimeşand zêdetirî navbertiyê, dişibînin dagirkirinekê. Tê gotin ku diviyabû NY'ê wekî rêxistineke navneteweyî ji bo lihevkirineke hundirîn bixebitiya, lê hêzên DYA'yê ji vê zêdetir xwestin wekî Şerê Kendavê daxwaza xwe bi darê zorê bidin qebûl kirin, dema ew çênebû jî berdan û çûn.

Nûçeyên Derve

## A. Perez Esquivel: 'Cuntayê xwest min bikuje'

Li gorî agahiya ajansa Diarios Notician ku hefteya çûyî ji Buenos Airesê daxuyand, di dema rêveberiya leşkerî de polîsên bahrê Xelatgirê Nobelê Adolfo Perez Esquivel girtine û xwestine wî biavêjin binê bahrê. Esquivelê ku di bîranînê xwe de wê demê wekî serdema şerê qirêjî bi nav dike û wiha dibêje:" Roja 5'ê gulana 1977'an dema min haziriya xwe dikir ku ji welêt derkevim, çar polîsan ez girtim û li keştiyekê siwar kirim. Hindik mabû ku min biavêjin nava bahrê, lê fermanek hat, wan dev ji kirina xwe berdan." Rêveberiya leşkerî ku di navbera salên 1975 û 1986'an li ser kar ma, 2 hezar kes avêtin nava bahrê. Gel bi protestoyên girseyê dawî li wê anîn. Dayîkên De Plazayê ku ji bo zarokên xwe li hemberî cuntayê şer kirin, niha doza cezakirina generalan dikin. Lê Rêveberiya sivîl naxwaza bi ser artêşê ve biçe ceza bike.

**Nûçeyên Derve**

**Hawrêman Zana Farqînîş kewte bin fermanî Sultaniyewe**

*Hevalên me Zana û Sultan zewicîn, em wan ji dil pîroz dikin. Jiyaneke şad û serfiraz ji bo wan dixwazin.*

*Xebatkarên Rojnameya Welatê Me*

## Zîrveya xizaniyê

Piştî civînên ku hefteyekê dewam kirin, li paytexta Danîmarkayê Kopenhagê di navbera rojên 11–12'yê adarê bi beşdariya giregirên 120 dewletî Zîrveya Neteweyên Yekbûyî "Ji Bo Bipêşketina Civakî" çêbû. Ev zîrveya bi piranî wekî 'Zîrveya Xizaniyê' tê binavkirin. Li ser rûyê erdê nêzî milyarek mirov di nava xizaniyê de dijîn û ew jî tirsa raperîneke giştî dixe nava dilê dewletên dewlemend. Ji ber vê yekê li zîrveyê bejin û bala xwe nîşan dan û ew tirsa xwe jî anîn ziman. Nûnerên hinek dewletên lipaşmayî xwestin ku deynê welatên xizan bên efûkirin, qet nebe jî taloqî demeke dûr bibin. Tenê Avusturya û Danimarkayê 266 milyon dolar deynê dewletên xizan taloq kirin. Dewletên împeryalîst nexwestin tu gavan biavêjin, gotin anîn ser rêvebeririya çewt û karên nelirê yên li welatên lipaşmayî. Ew tişt wekî sedema xizaniya wan welatan hate nîşandan. Di deklerasyona dawî de benda herî bikêr ew e; wê dewletên dewlemend ji sed 0.7'ê butçeya xwe ji bo alîkariya dewletên feqîr veqetînin, ji sedî 20'ê vî pereyî wê ji bo programên pêşketina civakî be. Ji welatên xizan jî tê xwestin ku ji sedî 20'ê butçeya xwe ji bo başkirina rewşa xizanan bi kar bînin.

Deklerasyon wisa hatiye amadekirin ku her dewlet karê wê li gorî dilê xwe şîrove bike. Wek mînak, Tirkiye li hemberî xala ku qala mafê çarenûsiyê dike derket, ew xal bi awayekî hate guhertin ku Tirkiye karibe ji nasîna mafê çarenûsiyê yê gelê kurd bireve, Erebistana Suudî rasterast got ku ewê deklerasyonê li gorî edet û qanûnên xwe tetbîq bike.

Mirovên xizan dizanibûn ku sedema rastîn a bêkarî û xizaniyê çi ye. Tu hêviya wan jî ji vê zîrveyê tunebû, ji ber vê yekê daxwazên xwe li derveyî zirveyê bilind kirin. Gotin:"Heke hûn dixwazin dawiyê li xizaniyê bînin, dewlemandan bixwin." Niha li dinyayê 120 milyon kes bêkar in. Newekheviya di navbera xizanan û dewlemendan de her roj zêdetir dibe, sedema vê yekê jî herkes dizane ku ev sîstema neheq e. Wekî Serokê Kubayê Fîdel Kastro jî got:" Heta ew sîstema ku dewlemendan dewlmendtir, xizanan xizantir dike hebe, pêşketina civakî pêkan e." Rêxisteneke wekî Neteweyên Yekbûyî ku bi her awayî li destê hêzên împeryalîst dinêre û girêdayê wan e, nikare birînên çewsandiyên cîhanê derman bike. Ew yek bi vê zîrveyê careke din derket holê û hate tesdîqkirin. Ji lew re deklerasyona ku ji aliyê rêxistinên demokratîk ve hate amadekirin wekî deklerasyoneke maksîst hate binavkirin.

**SAMÎ BERBANG**

# FAL

**BERAN (21 Adar – 20 Avrêl)**

Ev hefte ji bo we wê pir kêfxweş û biaram derbas bibe. Cihek heye ku hûn dixwazin herin û lê bigerin. Qet nesekinin, hûnê li wê derê demeke xweş derbas bikin.

**GA (21 Avrêl – 21 Gulan)**

Wisa dixuye ku hûn ji pir kesan xeyidîne. Hûn ji hevalên xwe yên pir nêzîk jî nagerin. Kesên ku ji we hez dikin, hûn îhmal dikin. Vê tembeliyê ji ser xwe bavêjin, bizvirine ser riya xwe ya berê

**CÊWÎ (22 Gulan – 21 Pûşper)**

Problemên ku li serê we diqewimin we pir bêrihet dikin. Wê gavê hûnê demek e pir xweş derbas bikin. Probleman ji hişê xwe bavêjin û li kêfa xwe biniêrin, hûnê serfiraz bibin.

**KEVJAL (22 Pûşper – 23 Tîrmeh)**

Evîn di jiyanê de dermanê her tiştî nîn e. Bi hevrebûna we baş neçe jî, li ber xwe nekevin. Di warê aboriyê de ji Xwedê hêvî nayê birîn û hûnê karekî baş bi dest bixin. Li gorî wê xwe amade bikin.

**ŞÊR (24 Tîrmeh – 23 Gelawêj)**

Demeke dirêj e ku destê we teng e. Divê hûn hinekî serê xwe biêşînin û vê meseleyê hel bikin. Lê belê ev problem pir giraniya xwe dide ser we. Armanca xwe û problemên xwe yên taybet têkilî hev nekin ku hûn bi pêş ve herin.

**SIMBIL (24 Gelawêj – 23 Rezber)**

Di van rojan da qet baweriya we bi tiştekî nayê, wê mirovek bikeve jiyana we, hûnê bi wî mirovî re demên pir xweş derbas bikin. Heke hûn bixwazin ku ev dema rengîn pir dirêj bidome, gerek e hûn dev ji diltenikiya xwe berdin.

**MÊZÎN (24 Rezber – 23 Kewçêr)**

Wekî demên berê hûn li cîhekî nasekinin, pir dişixulin û pir kes jî ji ber wê jîrbûna we, we pîroz dike. Ji wê rêya xwe dûr nekevin. Hinek tengasî li pêşiya we hene, hûnê bi alîkariya hevalekî xwe wan hel bikin.

**DÛPIŞK (24 Kewçêr – 22 Sermawez)**

Di têkiliyên xwe yên nû de hinekî baldar bin. Ew mirovên ku hûnê pê re bikevin têkiliyê pir dilzîz in û zû dixeyidin. Di vî warî de gerek e hûn zanebin da ku peyvên we xelet fêm nekin. Tiştên ku hûn dixwazin hûnê bi dest bixin.

**KEVAN (23 Sermawez – 21 Berfanbar)**

Ev çi halê we ye. Hûn qet li ser rewşa xwe nafikirin û xwe citikî diavêjin nava bûyeran. Li gorî bûyerên ku têne serê we bifikirin, rewşa xwe baş bikin. Kesên ku ji we hez dikin jî, bi wan zêde baweriya xwe neynin.

**KARIK (22 Berfanbar – 20 Rêbendan)**

Ew şikdariya we nahêle ku hûn baweriya xwe bi tu kesî bînin. ji we kirî ku herkes çala we dikole. Hişê xwe li serê xwe kom bikin, ne meçêtirkên şikdariyê. Ew kesên ku we nas dikin jî ji we hez dikin.

**DEWLIK (21 Rêbendan – 11 Reşemî)**

Hûn dîsa zemanê xwe qet bi tiştên pêwist derbas nakin. Ger hûn dixwazin ku jiyana we baştir bibe, wexta xwe nedin karên tewş. Çend kesên wê werin mêvantiya we, bi wan kesan re têkiliyên xwe baş bikin ku rewşa we baş bibe.

**MASÎ (20 Reşemî – 20 Adar)**

Romantîkbûn di rihê însanan de xisletekî nependî ye. Dema ku bêhna mirov diçike, hîngê xwe dide der. Divê hûn zanibin ku romantîkî bi yek serî nabe. Ji bo ku wateyeke romantîkbûna we hebe, divê hûn guh bidin dildara xwe.

# Têrsî Sêdarî

(Zazakî)

Rwejêk sêdkarêk şino sêd. Riyê xwi ser di raştî eskeron yeno. Eskerî vînênî ku wi çeltê xwi dara keno dard. Wexta sêdarî re benî nizd, sêdar vazdeno vêrnî yin û vano:

"Qomitan im! mi vazda, tawşanî vazda. Darî vurmuş lingon kerd. Sari seracêr torî kerd û dara dard kerd." Inê ser eskêrî dest û linganî yi girldanî, onî dew. Dew di dewijî yenî vernî, vanî qey in merdomî ma bêsuc yo. Şima inî beni ça? Eskerî zî vanî inî kufir kerdo. Dewijî sêdkarî ra persênî ku yi çi kufir kerdo. Sêdkar bersivî xwi di vano ku yi kufir nîkerdo. La tersinanî xwi ver guro ku yi ya rwej sêdariyê xwi di kerdo, yina vato. Yanê yi bi darî arweşêk kişto û kerdo tori, dara kerdo dard. Inê ser eskerî ca fek verdenîra.

MEMO DARRÊZ

# Nyemantiyê Kekî ti

(Zazakî)

Dorêk yo merdimêk şino kenawaştiş. Şond, badi nanwerdişiya, merdim wari kî re perseno ku ya çi gurî nyemanî xwi nîpersena. Cînek vana:

– Nyemanî ma sarî çimanî ma ser! Nyeman qê têpiya gurî xwi xwi dir nîbeno ya. Gere vajo. Inê ser nyeman paştî geno û ayi serî zerê xwi kenoa:

– Ez amiya nyemantiyê şima. Heger qedêrî Haomê bibo ti kênê xwi bidi mi.

Ina jû ser myantê cînek û nyeman di in vatê derbas benî:

Cînek: Kekê te heye çend salî?


Nyeman: Kekê te heye 20–25 salî.

Cînek: Na, na! Kekê min heye çil–çil û pênc salî.

Nyeman: Na wele! Te kekê xwe gelekî êşand û celqand.

MEMO DARRÊZ

# Di mafên mirovan de şampiyonek: Tirkiye




Neteweyên Yekbûyî, salên di navbera 1995 û 2005'an de wekî "Di peyrwerdeyiya Mafên Mirovan de 10 Sal" bi nav kir. Li ser vê yekê jî Wezîrê Karê Mafên Mirovan Azîmet Köylüoğlu ji bo ku dersên mafên mirovan di dibistanên navîn de bên xwendin projeyek amade kir. Li gorî projeya wî, wê li dibistanên navîn dersên mafên mirovan bên xwendin û li unîversîteya jî kursiyên mafên mirovan werin avakirin. Rayedarên dewletê îlan kirin ku ev yek di dinyayê de pêşî li Tirkiyeye pêk hatiye. Vê îdiayê di çapemeniya tirk de jî gelek cih girt û pê pesnê dewletê hat dayîn.

Ez dixwazim ji we re qala peymanên ku Tirkiyeyê qebûl kirine bikim. Peymana Mafên Mirovan ya Navneteweyî, Peymana Cenevreyê ya Şer, Peymana Hindikayiyan ya Navneteweyî, Peymana Zarokan ya Navneteweyî û hwd. Gelo, heta îro Tirkiyeyê şertên kîjan peymanê aniye cîh? Kîjan peyman li ser qaxizê nemaye? Gava mirov li rewşa Tirkiyeyê û Kurdistanê dinêre mirov çi dibîne? Li Tirkiyeyê hindikahî ji sedî çend mane? Rewşa zarokan çi ye? Rewşa şer çi ye? Li Tirkiyeyê hindikahiyan ji sedî 90 koç kirine û ewê mane jî rewşa wan li holê ye. Zarok di her karî de têne xebitandin û tu mafên wan tune ye. Di şer de dewlet tu qaîdeyan nas nake û şerêkî gemarî li Kurdistanê didomîne. Li Kurdistanê bi hezaran gund ji aliyê hêzên dewletê ve hatine valakirin û şewitandin. Bi sedan cînayetên failî meçhûl hene. Bi milyonan kurd koçber bûne. Nivîskar û rojnamevan di girtîgehan de bi sedan in. Rojname tên bombekirin, sansûrkirin, pirtûk tên topkirin û qedexekirin û hwd.

Ênca, Ezîmeto lawo, were dev ji projeya xwe berde! Dewleta we çî soz daye û îmze kiriye ji sedî 100 bere vajiya wê kiriye. Dev jê ber de. "Hirç û govend, dewleta tirk û mafên mirovan!".

ÎSMETÊ ÛSIF

www.arsivakurdi.org



17 sal berê roja 16'ê Adarê li ber Zanîngeha Stenbolê;

# Bombeya faşîstan 7 kulîlk şehîd xistin

Li gorî rewşa dinyayê di salên 70'yan de rewşa gelê Tirkiyeyê gelek baş bû. Ji ber wê yekê dewleta tirk hinek tedbîr standin. Di Nava van tedbîran de bikaranîna faşîstên sivîl jî hebû. Piştî ku ew fikir hate qebûlkirin, êdî rê li ber Partiya Tevgera Netewekar (MHP) vekirin. Wan çek û bombeyên xwe hemû ji depoyên leşkerên tirk temîn dikirin. Polîs tim li cem wan bûn. Saziyeke girêdayiyê wê partiyê bi navê "Ülkü Ocakları" hate sazkirin. Vê saziyê hemû ciwanên kuçeyan yên lumpen û avarê gihandin hev, hemû cerd û kuştinên xwe bi destê van kesên beredayî pêk dianîn.

Roja 16'ê adara 1978'an şûrkêşê faşîstên sivîl Sıddık Polat tevî çend hevalên xwe li ber deriyê Zanîngeha Stenbolê sekinîbû. Ew li hêviya derketina xwendekarên şoreşger bûn, dema ku xwendekarên şoreşger hatin nêzî wan, bombeyên di destê xwe de avêtin ser wan. Bi teqîna bombeyê;

Hatice ÖZEN
Hamit AKIL
Abdullah ŞIMŞEK
Murat KURT
Ahmet Turan ÖREN
Cemil SÖNMEZ û
Bakî EKÎZ

şehîd ketin. Ji xeynî van gelek xwendekar jî birîndar bûn. Tevî ku navên kujyarên faşîst dihate zanîn jî, kesî destê xwe neda wan, ji bo ku ew karibin kirinên bi vî rengî bidomînin.

**ESNAS MAYA**

Yekêk le nawe diyare kanî helbestî klasîkî kurdîman:

# Baba Tahîrî Hemedanî

(Soranî)




**Baba Tahîrî Hemedanî (935-1010)**

**"Lurî"**
*Zi dest dîde û dil her dû*
*feryad*
*Heraçe bîne, dil kuned*
*yad*
*Bisazem xincirî nîniş zi*
*pulad*
*Zenem ber dîde ta dil*
*gerded azad*

**"Soranî"**
*Le des çaw û le des dil*
*herdû feryad*
*Ke çaw herçî bibîne dil*
*eka yad*
*Ekam min xencerê nûkî*
*le polad*
*Îtir eydem le çaw ta dil*
*bê azad*

**Jiyanî Baba Tahîrî Hemedanî**

Sereray ewey ke mêjûy jiyanî Baba Tahîr zor tarîk e û ta êstaş zor layenî be şaraweyî mawetewe û natwanrê wekû pêwist derbarey ew şaîre gewreye qise bikrêt. Belam ewey ke sax botewe û cêgey gûman niye ewe ye, ke Baba Tahîr kurd e û be şêwey lûrî helbestî nûsîwe, lûrîş lehceyekî belgenewîstî zimanî kurdî ye û le zor serçawey mêjûyî da eme selmêndirawe. Lem bareyewe Mamosta Elaedîn Sûcadî delê: "Baba Tahîr honerêkî Iranî ye, newek farisî, we ew şêwe zimaney honrawekanî pê rêk xistiwe şêwe zimanêkî kurdî ye, belam dan bewe da denêyîn ke gelê wişey farisî têkel biwe", her mamosta Sûcadî xoy hoy eme degerînêtewe bo ew kes û çapxananey ke berhemekanî Baba Tahîr yan be çap geyandiwe, çûnke zorbeyan faris bûn. Belam eger temaşay wergêraneke Dilzarî şaîr bikeyin, ke helbestekanî kirduwe be soranî, ew şêwe zimane ke Dilzar be karî hênawe zor le deqe lûriyekewe nizîk e. Herweha Baba Tahîr le helbestekanî da wişey zorbey şêwe û nawçe ciya ciyakanî Kurdistanî be kar hênawe. Salî 1927 dîwanêkî bilawkirawetewe ke 365 çiwar xiştekî têda ye.

Dr. Said Xan delê: "Piyawêkî gawirî kurd delê: "Baba Tahîr çend helbestêkî be şêwey Goranî petî danawe û nardûye bo Heqekan, bo ewey ke le bîr û bawerî yek bigen, we ewanîş bixate ser ew rêgeye ke xoy le serî buwe. Daxekem ême ew helbestneman çing nekewit."

Elên felsefey nefsiyetî Baba Tahîr gelê ciyawaz e le gel hî Omer Xeyam. Omer Xeyam be dû çawî seyrî dû alem deka û le her dûkiyan dekolêtewe û le astî her dûkiyan rêgey bê Perwayî girdote pêş. Belam Baba Tahîr çende lem aleme da bê Perwa ye, ewendeş le alemkey keda be parêz û zor be wirdbînî rûy dilî merdimî tê eka.

**Bîrî Sosyalîzim û yeksanî le helbestekanî da**

**"Lûrî"**
*Eger destem resed ber*
*çerix gerdûn,*
*Ezan pursem ke în çûn*
*ast û an çûn?!*
*Yekî ra dadeyî sed naz*
*û nîimet*
*Yekî ra quris cew alude*
*der xûn!*

**"Soranî"**
*Eger destim bigate*
*çerxî gerdûn,*
*Epirsim lêy kewa em*
*çone û ew çûn?!*
*Yekê pêt dawe sed cor*
*naz û nîimet*
*Yekêkîş nanî coy*
*amêtey xûn!*

Baba Tahîr zor cor û şêwe helbestî nûsîwe û le nawerok da helbestî însanî, sofigerî û dildarî û le şeweş da westayane dayriştûn. Hen way bo deçin ke dahênerî şêwe nûsînî çiwarxiştekî ye le helbest da, xo eger waş nebêt ewa em qiseyeman bo helbestî kurdî giftûgoy le ser niye û ew yekem kes e ke em şewe helbestey nûsîwe.

Ewey lêre da mebestî bas û xwasmane, ew çiwarîneyetî ke le berayî em çen dêrewe deyxwênînewe. Lew çiwarîne da Baba Tahîr be aşkira bîrî sosyalîzm û wekhevî tê da be dî dekrêt û le civakî ewsay kurd û rojhelat da rastewxo rexne le mezintirîn deslatî bawer pêkiraw degrêt û rasterast delêt: "Eger destim be xûday gewre bigat, ciyawazî û kemasî em jîney lê depirsim ke bo waye, hen dirawin û heşin le birsa gêngil û azad beşe xorakiyan e."

Le ser jiyan û berhemî Baba Tahîrî Hemedanî dekrê lêkolînewe û lêgerînî berfirawan binûsrê, çunke ew zor lewe gewratir e ke be nûsînêkî serpêyî be ser bikrêtewe.

Serçawe:
1. Mêjûy Edebî Kûrdî, Elaedîn Sûcadî
2. Deqekanî Edebî Kurdî, Elaedîn Sûcadî

**SÎRWAN REHÎM**

www.arsivakurd.org

# 'İŞKENCE LI TIRKIYEYÊ SIYASETA DEWLETÊ YE'

**Dewleta tirk, îro her cure pêkanînên antî–demokratîk bi mucadeleya xwe ya bi PKK'ê ve girêdide. Halbûku eger li ser pêvajoya 70 salên dawî ya dîroka Tirkiyeyê bête rawestîn, wê bête dîtin ku hîna PKK tunebû jî pesta dewletê li ser kurdan hebû. Dema ku Şêx Seîd, Seyîd Riza û rewşenbîrên din ên kurd hatine dardekirin, dema ku di 1938'an de Dêrsim hate şewitandin, hilweşandin, bi hezaran mirov hatin qetilkirin, kurdî hate qedexekirin, navên gundên kurdan hatin guhertin, hingê PKK tunebû, lê pesta dewletê hebû. Çi dema ku kurdan xwestine bi nasnameya xwe hebin, her tim pest dîtine û dibînin.**



*Eger Eren Keskin bikaribûya biçûya civîna li ser mafên mirovan wê ev nivîs bixwenda. Bes rê li ber hate girtin. Wê jî nivîs bi faksê ji civînê re bi rê kir. Em qismekî ji nivîsa wê werdigerînin û pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.*

Wekî ku sernava mijara ku ezê li serê bisekinim jî ev e, heta ku pêkhatinên 70 salên borî yên rejîma Komara Tirkiyeyê neyên pirsiyarkirin, ne mumkûn e dema îro jî bête fêmkirin û vegotin.

Eger em bala xwe bidin beriya 70 salan, emê bibînin ku piştî ku ev dewleta komara Tirkiyeyê ya ku bi pêşengiya Mustafa Kemal û piştgiriya mezin ya kurdan hate avakirin û dema hinek bêhn stand, nasnameya kurd hate înkarkirin. Bi vê înkarkirinê û piştî wê, navên kurdî yên li gund û zarokên kurdan, hatine qedexekirin û Kurdistan bi hiqûqeke cihê hatiye îdarekirin.

Pêvajoya 70 salan li Kurdistanê gelek qanûnên dijdemokratîk hatine derxistin. Mesela, Qanûna Îzaleyê Şeqavet, Qanûna Dêrsimê, Qanûna Dadgehên Îstîklalê, Qanûna Paşnavan, Qanûna Bicihkirinê, Qanûna Takrîrê Sukûnê û gelekên din...

Îro jî Kurdistan bi Qanûna Herêma Rêvebirina Taybet tê îdarekirin. Di destê waliyê herêma taybet de jî rayeyên taybet hene. Li gorî xala 7'an a Qanûna Rêvebirina Taybet, doza îptalê nikare der barê pêkanînên walî de bête vekirin.

Komara Tirkiyeyê, îmze daniye bin Peymana Mafên Mirovan a Ewrûpayê. Tevî vê yekê Qanûnên herêma Rêvebeirina Taybet vê peymanê îhlal dike. Îro li gorî vê qanûnê muhleta libinçavmayînê 30 roj in. Li Kurdistanê cînayet, îşkence, windabûn jî bêqedar in.

Mesela, di pêvajoya sê mehên dawî yên sala 1993'an de hejmara kesên li bin çav hatine kuştin û windakirin 218 e.

Dewleta tirk, îro her cure pêkanînên antî–demokratîk bi mucadeleya xwe ya li hemberî PKK'ê ve girêdide. Halbûku eger li ser pêvajoya 70 salên dawî ya dîroka Komara Tirkiyeyê bête rawestîn, wê bête dîtin ku hîna PKK tunebû jî pesta dewletê li ser kurdan hebû.

Dema ku Şêx Seîd, Seyîd Riza û rewşenbîrên din ên kurd hatine dardekirin, dema ku di 1938'an de Dêrsim hate şewitandin, hilweşandin, bi hezaran mirov hatin qetilkirin, kurdî hate qedexekirin, navên gundên kurdan hatin guhertin, hingê PKK tunebû, lê pesta dewletê hebû. Çi dema ku kurdan xwestine bi nasnameya xwe hebin, her tim pest dîtine û dibînin.

Îcar em behsa îro bikin. Ev deh sal in ku li Kurdistanê cengek didome. Di vê pêvajoyê de li dora 2 hezaran gund ji aliyê hêzên dewletê ve hatine şewitandin û hilweşandin.

Li Kurdistanê, li girtîgehên ku mahkûmên kurd lê dijîn îhlalên mezin yên mafên mirovan tên dîtin. Mesela di meha 10'an a 1994'an de li girtîgeha Diyarbekirê leşker û polîsan bi bombeyan dîwarên qawişan hilweşandin, êrîşî ser girtiyan kirin. Di van êrîşan de Ramazan Özüak (17 salî) hate kuştin.

Ji bo ku li cih em agahdar bibin, dema ez û hevalê min ê Ebûqat Osman Ergin em çûne Diyarbekirê, li taxa Bağlarê ji mînîbûseke spî erebeya me gulebaran kirin.

Ji ber ku li Kurdistanê rewş ev e, kesên ku ji ber cengê malên wan têne şewitandin, îşkence li wan tê kirin û bi destê kesên nenas têne kuştin, ji koçkirina ber bi bajarên mezin pê ve tu çareyê nabînin.

Kurdên koçber dibin giranî ber bi Diyarbekir, Edene, Mêrsîn, Îzmîr û Stenbolê ve diçin. Kurdên ku koçberî van bajaran dibin ji aliyê aborî û civakî ve di rewşeke zêde xerab de ne. Beriya her tiştî pirsgirêka wan a bicihbûnê heye, nikarin cihê mayînê bibînin û zehfê ☞

wan li ba lêzimên xwe dimînin.

Pirsgirêka kurdan ya herî girîng nasnameya li ser wan e. Li ser nasnameya kurdekî/ê, eger navê bajarekî kurdan nivîsandî be, her tim îhtîmala wî(wê) ya ketina binçav heye. Mesela kurdekî bi navê Bahattin li Stenbolê, dema di cadeyeke Taksîmê de ji xwe re dimeşe, polîs li nasnameya wî dinêrin û wî dibin qereqolê davêjin nezaretê. Li wê derê lê didin, heta ku di laşê wî re şoşîna dikin. Paşî ji polîsan dipirse ka sûcê wî çi ye, jê re dibêjin: "Sûcê te ew e ku tu kurd î!" Sedhezar TL yê di bêrîka wî de jî, jê distînin û berdidin.

Pirsgirêkeke kurdan a din jî, bêkarî ye. Demekê li Stenbolê formên kar li hemû karistan û xebatxaneyan hatin belavkirin û cihê jidayikbûyîna karkeran ji wan hatiye pirsîn.

Li Tirkiyeyê, muhleta libinçavmayînê di bûyerên jirêzê de 24 saet, herî zehf jî 4 roj in. Feqet di dozên siyasî de ev muhlet 15 roj in, li herêma Rêveberiya Taybet jî 30 roj in. Li Tirkiyeyê îşkence siyaseta dewletê ye.

Li metropolan ji bo kurdan pirsgirêkeke din jî binçavbûnên tomerî ne. Di binçavkirinan de armanca dewletê ew e ku bi tirs û zilmê rê li ber piştgiriya neteweyî ya navbera kurdan bête girtin.

Lê pirsgirêka herî girîng a kurdan ku hemû pirsgirêkên din di bin siya xwe de dihêle MAFÊ JIYANÊ ye.

Di herdu salên dawî de bi sedan rewşenbîr, nivîskar, karsaz, xwendekar û siyasetvanên kurd hatine kuştin û tu qatîlên yekî ji wan bi tenê jî nehatiye girtin.

Ez jî sûcdarê fikrî me, tevî ku pir dixwazim niha beşdarî vê civînê bibim, ji ber ku qerara girtina min ji aliyê Dadgeha Bilind ve hate derxistin, ji ber vê yekê rê li ber beşdariya min a civînê hate girtin. Divê bête zanîn ku ji ber vê nivîsê rê li ber min girtin, bila ev jî wisa bête nirxandin.

EREN KESKİN



**PORTRE**

## KEÇA BAVEKÎ KURD, DIYEKE ÇERKEZ

Ebûqat Eren Keskin di sala 1959'an de li Bursayê hatiye dinê. Bi eslê xwe ji Hafikliya Sêwazê ye. Bavê wê kurd, diya wê jî Çerkez e. Tevî vê yekê heta berê dozdeh salan haya wê ji çanda kurd û çerkezan tunebûye. Ji ber ku bavê wê kurê Waliyekî Kemalîst bûye û bi çand û îdeolojiya Kemalîzmê mezin bûye. Di sala 83'yan de nêzîkî rêxistineke çepgirê tirk bûye. Ji nava rêxistinê yekî kurd tiştên ku wê qet nebihîstibûne, der barê kurdan de anîne zimên. Paşî ji xwe ew kes jî, ji rêxistinê qetiyaye û gihîştiye PKK'ê. Bi tesîra dîtinên wî, bi Eren Keskin re meraqek çêdibe li ser kurdan û ji wê rojê ve heta îro Keskin nêzîkî kurdan dibe. Pirtûkên li ser dîroka kurdan dixwîne, nêrîn û îdeolojiyên rêxistinên kurd nas dike û doza mafên kurdan dike.

Ev deh sal in ku ew ebûqatiyê dike. Bi giranî li dozên siyasî dinêre. Wisa bûye ku êdî îro li Dadgehan dewleta tirk dozger û dadger bi çavê Ebûqateke ji PKK'ê li Keskinê dinêrin. Eren Keskin niha Ebûqatiya nêzîkî 200 dozên siyasî dike.

Ew heta sala çûyî di kargeriya Komeleya Mafên Mirovan de bû. Hem ebûqatî dikir, hem jî pêvajoya çar salan di kargeriya KMM'ê de xebitî.

Eren, ne tenê li Tirkiyeyê, li Ewrûpayê jî di nav rêxistin û der dorên demokratîk de mîna parêzera mafên mirovan tê naskirin. Ji ber vê yekê gelek dostên wê hene. Li aliyê din ên ji wê nexweş jî ne hindik in. Her roj bi telefonan tê tehdîtkirin, tê taqîbkirin. Bi taybetî jî di demên dawî de tehdîtên li hemberî wê zêde bûn. Ji ber vê yekê, Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî beriya du mehan qerar stand ku wê bi xwe biparêze. Li Tirkiyeyê yekemîn kes e ku ji aliyê wê rêxistinê ve tê parastin. Eren xebatên KMM'ya li Tirkiyeyê baş nabîne. Li gorî wê gelek kesên di vê komeleyê de pir di bin tesîra kemalîzmê de ne, ji ber wê yekê xebatên komeleyê baş nameşin. Eren, li Tirkiyeyê, endama gelek rêxistin û komeleyên demokratîk e.

Ji xeynî ebûqatiyê niha di kargeriya TOHAV'ê de jî cih girtiye û lêkolînên xwe yên li ser mafên mirovan didomîne.

Di Özgür Ülke û Özgür Gündemê de gelek nivîsên wê li ser kurdan û doza kurdan derketine.

Pirtûka ku dawî ya ku wê xwendiye jî, weşanên AFA'yê "Faşîzm bilind dibe" ye.

**Ebûqeta rojnameya me Eren Keskin jî dikeve hepsê, çunkî;**

# 'Dinya ji gelê kurd re deyndar e'

Ebûqeta rojnameya me û ya gelek rojname, sazî û kesên welatparêz, Eren Keskin roja 20'ê Adarê ji ber nivîseke xwe dikeve girtîgehê.

Roja 14'ê Adarê qerara girtina Keskin li gorî xala 8–1'an a hejmara 3713'an a qanûna li dijî terorê ji aliyê Dadgeha Bilind a Dewleta Tirk ve hate standin.

Keskin ji ber nivîsa xwe ya bi navê "Dinya deyndarê gelê kurd e" ku sala çûyî di rojnameya Özgür Gündemê de derketibû bi du sal cezayê hepsê û 250 milyon TL cezayê diravî hate cezakirin.

Li ser vê yekê Ebûqat Eren Keskin bala me kişande ser dema standina vê qerarê. Li gorî agahiyên ku me ji devê Keskin standin, gelek doz der barê wê de hatine vekirin û niha gelek dosyayên dozên wê yên ji berî vê ya gihîştiye encamê, li cem Dadgeha Bilind in. Tevî vê yekê ji nişka ve mehkemeyê ketûberî dosyayek ji nav dosyayên wê kişandiye û di rojekê de qerara DGM'ê tesdîq kirine.

Eren Keskin vê qerarê mîna tewreke plankirî dinirxîne û li ser vê yekê wiha dibêje: "Berî niha demekê kurt ji Almanyayê ji Hikûmeta Federal ji min re dawetiyeyek hat, ji bo ku ez beşdarî civîneke li ser mafên mirovan bibim. Civîn ji aliyê Komîsyona hundirîn a hikûmeta Federal ve hatibû plankirin û ji Tirkiyeyê li ser navê saziyên sivîl ezê beşdar bûbûma. Nûnerekî dewleta Tirk jî li ser navê dewletê dawet kiribûn. Minê di civînê de rewşa gelê kurd bianiya zimên û der barê qewimînên dawî de agahî bida beşdarên civînê. Dema dewletê bihîst ku ezê neheqî û pêkutiyên wê di civînê de bînim zimên, hingê bi lezgînî mudexele kir û qerara girtina min bi Dadgeha Bilind da standin."

Ebûqat Keskin, di demeke ku Tirkiye haziriyê dike ku bikeve yekîtiya Gumrukê de, vê qerara dewletê wiha dinirxîne: "Esas di demeke wiha de gelek kesan hêvî dikir ku dewlet efûya giştî ilan bike, lê divê bête zanîn ku çiqas hin şaxên di nava dewletê de pariyekî demokrasiyê bixwazin jî, dewlet ne yekpare ye. Em îro nikarin behsa yekparetiya dewletê bikin. Di navê de pir şaxên dijber hene. Esas yên ku daxwaza demokrasiyê tînin ziman jî, li gorî van daxwazan hîmek ava nekirine, kirin û gotinên wan li hev nakin. Ji ber vê yekê hêviya min bi xwe ji demokratîkbûna vê dewletê tune. Dewletên rojavayê jî riyakariyê dikin, nexasim jî Almanya di riyakariyê de di pêşiya hemûyan de ye.

Me dîtinên Keskin li ser aştiyê jî pirsîn. Li gorî Keskin ne mumkûn e bi destê dewletên rojavayê an jî bi navgîniya kesên ku ne terefên şer in aştî çêbe. Eren Keskin tîne zimên ku aştî tenê bi destê herdu aliyên şer, dikare çêbe. Ev herdu alî jî diyar e ku kî ne.

Daxwaz û hêviya wê ew e ku bi lezgînî dewlet û PKK şer rawestînin ji bo ku îmkana danûstandinên aştiyê çêbin.

Eger dewlet qerareke din a surprîz dernexe û poşman nebe, roja 20'ê adara 1995'an Eren Keskin wê bikeve girtîgeha Bayrampaşayê. Keskin wê nikaribe beşdarî civînê bibe, lê ewê nivîsa xwe ku wê di civînê de bixwenda, ji komîsyona civînê re şand.

**Welatê Me/Stenbol**



## JINÊN BAĞCILARÊ 8'Ê ADARÊ PÎROZ KIRIN

Li HADEP'a navçeya Bağcılarê, bi mebesta pîrozkirina Roja Jinên Kedkar şahiyek li dar ket. Şahî ji aliyê Komîsyona Jinên HADEP'a vê navçeyê ve hatibû organizekirin, nêzîkî 500 kesî bi beşdariya xwe ev pîrozbahî geş kir. Şahiyê bi marşa Ey Raqîp dest pê kir. Pişt re Seroka Komisyon Jinan Elif Reyhanê axaftinek kir. Ew di axaftina xwe de bi taybetî li ser rewşa jinan, dîroka bindestiya jinan û şerê jinan yê li dijî vê rewşa kambax, sekinî.

Şahî bi starnên Ozan Xanemîr, Koma Gulên Xerzan û Ozan Aynur Doğan'ê qediya.

www.arsivakurd.org

# Li Dêrsimê 15 leşkerên artêşa taybet hatin kuştin

Buroya ARGK'ê di 1'ê adarê de bîlançoya şer ya meha reşemiyê ji Kurd-A re şand. Li gorî daxuyaniya ARGK'ê di meha reşemiyê de li 56 cihan livbazî çêbûne. Di wan livbaziyan de 6 kesên birutbe, 5 çawîşên daîmî (uzman çavuş) û 94 leşker hatine kuştin, ji xeynî wan 37 leşker jî hatine birîndarkirin.

Di vê mehê de 8 cerdevan di şer de mirine, 11 cerdevan jî birîndar bûne û 2 cerdevan jî rehîn hatine girtin.

Li gorî raporê di eynî pêvajoyê 44 gerîla mirine, 9 jî birîndar bûne. Tê gotin ku hêzên ARGK'ê dest danîne 2 çekên M-27, namluyekî M-27, MG-3'yek, 2 namluyên MG-3, 40 berikên M-16, 150 berikên MG-3 û şerîdên wan, 150 berikê BKC'ê û şerîdên wan, 120 berikên keleşan, 120 berikên M-18, 2 zincîrên berikan, 13 jarjorên G-3, 3 jarjorên keleşan, 4 jarjorên M-18, 16 bombeyên destan, 7 roketên B-7 û berikên wan, 2 roketên hawanan, 2 seatên destan, 4 qaput, 3 êlek, bataniyek, palasqeyek û qawîşeke piştan.

Dîsa di meha reşemiyê de 2 firoke (helîkopter), 9 cemseyên leşkerî, 3 tir, erebeyek, trektorek, tankerek, minibûseke cerdevanan, 3 panzer û 17 dîrekên têlefonê û yên ceyranê hatine rûxandin. Ji ber livbaziyan 14 cerdewanan dev ji cenga qirêj berdane û xwe radestî gerîla kirine.



**8.3.95**

Li çiyayê Gabarê gerîlayên ARGK'ê êrîşî tîmên taybet kir, ew dan revandin. Di vî êrîşê de gerîlayan dest danîn ser 2 çenteyan, makînekê wênekêş û 100 guleyên G-3'ê.

Hêzên dewletê li dora Qilabanê dicivin. Piştî kemîna gerîlayan ku tê de 30 leşker hatibûn kuştin, ji bo operasyonê nêzîkî 3 hezar leşker hatin herêmê.

**9.3.95**

Gerîlayên ARGK'ê êrîşî leşkerên li gundê Hazeriya Malkişê kirin. Di êrîşa gerîlayan de 9 leşker mirin, gelek birîndar bûn.

Gerîlayan avêtin ser mewziyê qereqola Avdireka Dersimê. Di cerda gerîlayan de 3 leşker mirin, leşkerek birîndar bû. Gerîlayan dest danî ser G-3'yeke portatîf, 6 çekên G-3 û 120 berikên G-3'ê, dûrebînek, çenteyek, û hwd.

**10.3.1995**

Hêzên dewletê li Cizîrê ketûber dadikin ser mala û lêgerînê dikin. Taxa Sur, Dicle, Kurtuluş û Eskidağ dibin eblûqeya leşker û cerdevana dene.

Erebeyeke leşkerî li Culemêrgê ji zinêr wer bû, 2 leşker mirin. Teğmenek di çemê Hêzil de xeniqî. Tê gotin ku 2 leşkerên din jî birîndar ji çem hatine xelas kirin.

**11. 3. 1995**

Li Şirnexê, li navçeya Cizîrê hêzên dewletê ketin û derketina nexweşxaneyê ji bo ku sivîlan qedexe kirin. Tê gotin ku, ev yek ji bo hejmara birîndar û miriyên şerê dora Cudî eşkere nebe, kirine.

Polîsan li Edenê avêtin ser malên malbatên gerîlayan û malbatan tehdît kirin.

Li Habizbînaya Mêrdînê, gerîlayên ARGK'ê 4 cerdevan dîl girtin. Di gel cerdevanan 2 keleş û 2 çifteyên nêçîrê jî dest danîn ser, cerdevan di destê gerîlayan de ne û pirsiyariya wan didome.

Li Êlîhê di qerargeha leşkeran de sîlaha leşkerekê bi navê Bekir Arikoğlu teqiya, gula ku teqiya rastî bînbaşî hat bînbaşî birindar bû.

**12. 3 .95**

Li gundê Aco ku li ser Hezoyê ye , kesekî bi navê Hasan Demir ji aliyê polîsan ve hate binçavkirin.

Li çiyayê Gabarê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket, gerîlayan, ji du-sê milan ve êrîş birin ser leşkeran û 16 leşker kuştin.

Hêzên dewletê li navenda Silopiyê dest bi operasyonan kirin û di wan operasyonan de nêzîkî 60 welatperêz girtin bin çavan.

**13. 3. 95**

Li Heftanînê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket, di vî şerî de 6 leşker hatin kuştin. Li ser çemê Zapê, 2 leşker ji zinêr ketin û mirin. Tê gotin ku leşker ji bo ku pirake seyar ava bikin, di xebatê de bûne.

**14. 3. 95**

Li Dêrsimê, li gundê Hazerî gerîlayên ARGK'ê êrîşî leşkerên artêşa taybet kirin, di êrîşê de gerîlayan 2 mewziyên dewletê xistin dest û 13 tîmên taybet jî kuştin. Di dawiya şer de gerîlayan dest danîn ser MG-3 yek, 5 şerîd û 360 berikên MG-3'ê, çekeke portatîf ya MG-3'ê û jarjorên wan, 2 çekên M-18'ê, 2 jarjor û 150 berikên wan, depanceyeke çardexwar, dûrbîneke çekên M-16 û gelek malzemeyên cur bi cur.

Cerdevanên gundê Şêx Hamzayê, li hevdan. Di şerê navbera cerdevanan de cerdevanek mir, ji herdu aliyan gelek cerdevan birîndar bûn.

Li gundê Tikana Sasonê, cerdevan li mayina gerîlan leqitîn, 2 cerdevan birîndar bûn. Birînên cerdavanan xedar e.

**Welatê Me/ Kurd-A**



**Yılmaz (Battal)**
**(1975-....)**

*"Şehîd nemir e wek çiya*
*weke berf û weke bihar*
*şehîd av e*
*tîna zeviyê dişkêne*
*tilî û dest e*
*êşa axê dihejîne.*
*Ronahiya çav e*
*kîjan pêşeroj dûr e*
*dibîne.*
*Şehîd: Bejna wî*
*qasî bejna Kurdistan e."*

***Ş. Bêkes***

*Di 21'ê berfanbarê de bi çar hevalê xwe re li Nisêbînê şehîd ket.*

**Hamdullah Yali**

## Ji HADEP'a Edeneyê Müslüm Kurucu:

# 'Emê Newrozê pîroz bikin ne nevruzê'

*Welatê Me li ser Newroza îsal bi Endamê Lijneya Rêveberiya HADEP'a Edeneyê Müslüm Kurucu re hevpeyvînek çêkir.*

**Tê gotin hinek xebatên dewletê hene ji bo ku newrozê bike nevruz.**

– Erê erê! Jixwe dema hevdîtiname ya bi walî re me da zanîn ku em dixwazin di 19'ê mehê de newrozê pîroz bikin. Walî got:"Hûn çima di 19'ê mehê de pîroz dikine, newroz ne di 21'ê mehê de ye, emê di 21'ê mehê de pîroz bikin, hûn jî werin li ser navê gelê herêmê çend axaftinan bikin, nevruz cejna hemû Tirkiyeyê û komarên tirkî ye."

**Li hemberî vê gotinê tewra we bû çi?**

– Em li hember derketin. Me got ku wekî partî hinek amadekariyên me çêbûne, me jî hinek koman soz girtiye. Bi kurtasî me da fêmkirin ku em naxwazin bi wan re pîroz bikin.

**Encam bû çi?**

– Me ji bo 22'ê mehê serîlêdana xwe kir û ew hate qebûlkirin. Em bi wan nexapîn. Newroza 3 hezar salî bi nevruz yek salî guhertin li ba dilê gel sûcekî mezin e. Wekî encam em hemû gelê xwe yê li Çukurovayê di 22'yê adarê de dawetî Açıkhava Tiyatrosu'ya Mimar Sinanê dikin. Emê di navbera 10 û 18'an de Newroza xwe pîroz bikin.

**Spas.**

– Ji bo ku we ew îmkan da min ez spas dikim.

**Hevpeyvîn:**
**Salihê Kevirbirî**

## PKK'ê ji bo cejna Newrozê daxuyaniyek belav kir:

# 'Komîteyên parêziyê ava bikin'

Hinek rêxistinên kurd li ser Newroza 1995'an daxuyanî weşandin. Komîteya navendî ya PKK'ê daxuyand ku îsal wê gelê kurd di bin siya çeka gerîla de Newrozê azadtir pîroz bike. Tê gotin ku îsal ji her salê pirtir gelê kurd nêzî serxwebûn û azadiyê ye. Li gorî daxuyaniyê dewlet ji ber ku li hemberî gerîla têk diçe berê xwe dide gel, dixwaze ji xeynî mirovên li bajarên di bin kontrola wan de, hemû kurdan koçber bike. Daxuyaniya ku ji aliyê Komiteya navendî ya PKK'ê ve hatiye weşandin ji gelê kurd dixwaze ku bajarên Kurdistanê û metropolan ji livbaziyên xwe re bikin war û komiteyên parêziyê ava bikin.

Serokê HADEP'a Edeneyê A. Samed Yaman jî dide zanîn ku ewên roja 22'ê adarê li Tiyatroya Açıkhavayê ya Minan Sinanê Newrozê pîroz bikin.Yaman, gel bi daxuyaniyekê vexwendî pîrozbahiyê dike.

Tevgera Îslamî ya Kurdistanê Newrozê wekî li hemberî zilmê liberxwedanekê bi nav dike. Ew bal dikişîne ser şerê di navbera Deheqê vê demê û Kawayên Hemdem. Ew di daxuyaniya xwe de dibêje ku gelê kurd bi têkoşîna neteweyî yekitiyeke xurt ava kiriye. Daxuyanî bi pîrozkirina Newroza 1995'an ya gelê kurd diqede.

www.arsivakurd.org



# Qîrnayişê azadiyey

## FÎLMÊ VIJÎNAYEY

**(Zazakî, kirdkî)**

**Namey fîlm:** Qîrnayişê Azadiyey/ Cry Freedom
**Y./ Sermiyan:** Richard Attenborough
**S./ Nuştox:** John Briley
**K./ Kaşkerdox:** Ronnie Taylor
**K./ Hedirnayox:** Lasley Walker
**Muzîk:** George Fentom, Iones Gwangwa
**O./ Kaykerdoxî:** Josette Simon, Kevin Kline, Penelope Wilton, Wabei Siyalwe, J. Coine
**Welat:** Îngilîstan/ Ingilind,1987

Ma heme zanê ki Afrîka ya Başûr heta yew di serrî ra ver mêrdimî siyay welattê xwi di azadî nêbî. Mêrdim andê sipî ya, hinzar yew eziyet, hinzar yew îskence kerdênê jîn. Çik zengîneya welattê jîn (siyaya) bi pêro sipiya destibê... Eses wayîrê ayê herra zî xwi rê kerdîbî kole... Yonî, sipî ya him welatê siyay a dest ra girotbê, him jîn ra tayinbî, him zî jîn rê sermiyaney kerdê... Yew na heway ra, sipî ya, siyay ra zorakî yew rez girotbê, labelê yêw goşey ingûr i nêdaynêbidê... Yonî xwi rê sey tirk an' û kurdan bi!..

Serrî 1975. Aşîret ra Bantu ran ra Stephen Biko, anasar yew welat di, feqîrey reyda pîl beno. Bêîmkanêy reydê honeno. Şono mekteb dê doxtora.. Wextra o zî sey zafin deyaxê inî neheqey nêkeno, isyan keno, hukmatî vero yeno... Hukmat jey tebîşeno, çend ray fîneno hepis a, zîndana, îskence keno bide. Labelê o, ancîna zî fiqran dê xwi ra nêbeno, nêveyreno... No beyntar di yew rojnamevanî sipî sinasneno. Namey jey Donal Woods o, wextra benê embazê cê.

Woods, tikê liberal o... Labelê verêney dê qalandê, fiqrandê Bîkoyra çî fam nêkeno... Eyla wextra fiqrê Woodsî bedilyênê, o zî beno hetê Bîkoy, hetê mazlum a heqliya...

Labelê no hewa weşbê hukmatî (dîktatorey) nêşano. Verê Bîkoy bindê îskencêdê kişênê, badî zî kenê ki Woods î bikişê...

Biko; çim dê dewleti di "terorîst"bi, dewlet jey kişt... Labelê Bikay ra dim, hinzara reydê Bikoy vejiyay...

Woods, namey ayê îskenceciya dîktato ra çevî vîrîdê niyo, labelê namey Woodsî, namey Î. Beşîkçî, H. Gerger î, F. Başkaya y, Vedat Türkalî dinya sinasnena...

Nelson Mandela; çimdê dewlet (an) di "terorîst"bi, eyro serekê Afrîka ya Başûr yo.

De ma faşîstandê mara daha weşî senî hewa vajê ki peyniya şima zî nizdiya!...

Ma di rojîra pey, (21 Adar 1995) di roşona piya bimbarîkê (pîroz) kenê... Newroz dê Meclîsê ma kurda awan beno. Inkayra, him Newrozê ma, him zî meclîsê ma, mapêrinrê pîroz (bimbarikên) bo...

CEMAL PÎRANIJ



**RICHARD ATTENBOROUGH**

1923 di Cambridge di mar da xwi ra biyo. Londra di şiya mektebdê kaykerdoxa. 1942 di fîlm da Noel Coward (In which we serve") di kaykerd. Tira pey 50 heb fîlm dê karkerd. 1959 di fîlm şîrketî ya xwi viraşt (ake). 1982 di fîlm da "Gandî reydê Oscar girot.

**Fîlmoxrafiya jey**

**1968** Oh! What a lovely war/ Ax! Çika yew herb o rindo
**1972** Young Winston/ Xorto Winston
**1977** A Bridge Too Far/ Yew Kopriyo durî
**1978** Magir/ Sêr
**1982** Ganhi
**1985** A Coras Line
**1987** Cry Freedom/ Qîrnayişê Azadiyey

# AZADÎ

## Dîsa jî oxweş



**ABDURRAHMAN DURRE**

Berî salekê di rojnameya Welat de nivîseke min ya bi navê "Oxweş" hatibû weşandin. Ev nivîs pir li xweşiya xwendevanan hatibû, heta niha jî hêj di bîra hinek xwendevanan de maye,"oxweş" dibêjin.

Çîroka "Oxweşê" bi kurtî wiha ye;

Li gundê Dîknoka Melazgirê bi navê Mihemdê Hiço (Rihmeta Xwedê li wî be û li miriyên we be) kalekî şareza hebû. Di camiya gund de li ber sobeyê rûdinişt û cixara xwa dikşand û guhên xwe didan Mele Simoyê Rehmetî ku ji cemeatê re çîroka "Cengnameya Hezretî Elî" dixwend. Di çîrokê de digot: " Hezretî Elî di fîlan cengê de evqas tekbîr dane, bi her tekbîrê jî bi sedan, bi hezaran kafir kuştine. Heta ku bû nêzîkî êvarê, kafirekî tîrek avêt li nava dilê sihabiyekî da û ew şehîd xist." Cemata li camiyê gişkan bi hev re digotin: "Wey kafirê kurê kafiran, wax û wax, çawan wî ew sihabî kuşt."

Mihemedê Hirço yê Rehmetî serê xwe radike û bi dengekî bilind dibêje: "Oxweş, ez qurbana wî bim, wî dilê min rihek kir. Mele Simo ca careke din jî bixwîne." Cemeat dibêje:" Yah yah tu dîn bûyî, tu dibî kafir wisa nebêje." Mihemedê Hirço dibêje: "Lo lawo sed carî "oxweş", Eliyê we ji sibê ve ketiye nava wan însanan, wekî palaxê dibire û qir dike, hûn dikenin û şa dibin. Ma qey ew jî ne mirov in, ew jî ne xwîn û goşt in, hûn wekî guran ketine nava wan û dikujin?! De bila yek jî ji wan ereban bê kuştin ma qiyamet ranabe, "oxweş " û sed carî jî "oxweş."

Belê xwendevanên hêja di van rojan de dîsan filehan êrîş dane ser azeriyan; sirb jî êrîşan dibin ser Bosnayê û dîplomatên kurdan jî êrîşên dîplomasiyê yên xurt tînin ser dijmin. Ewrûpayê jî zor bi Zeyneba Zer xistine, gerîlayên kurdan jî, xwe ji cenga zaferê re amade kirine.

Hiko û Zeyneb bêçare mane, kenê ber mirinê dikin. Êdî dawiya viran li hemûyan jî hatiye. Yek çareya wan maye, (nasîna) demokrasiyê û mafên mirovan. Lê hê jî di binê vê perdeyê de xwe ji rastiyê vedişêrin. Belê rastî ev e; kurd û Kurdistan, biratî, demokrasiya heqîqî, wekhevî, mirovî. Bi baweriya min tu rê û çare ji gur û dêleguran re nemane. Wê ne bixêra Bavê xwe, heq û hiquqên gelê kurd qebûl bikin û buhayê xwîna azadiyê bidin. Tu çare nemane, êdî ji çewkînê ketine zexel zexel mêze dikin û digirijin. Bi kurtî, di hemû waran de gur bûne seyên qiyametê. Ji ber vê yekê heke Mihemedê Hirço yê Rehmetî sax bûya wê bigota, "Oxweş ku ermeniyan êrîş dane ser azeriyan" Divê em jî bibêjin "Oxweş" ku êdî kes bi kîloran jî guh nade " Zeyneba Zer" "Oxweş û sed carî oxeş"



# FÎL Û TOLA TÛTIYÊ

Hebû tunebû li welatê me fîlek hebû. Ew fîl li guhêrekî diçêriya. Di wî guhêrî de jî hêlîna tûtiyekê hebû. Tûtiyê çêlikên xwe mezin kiribûn, anîbûn ber firê. Fîl dema diçêre rastî wê hêlînê tê. Lingê xwe radike ku pê li hêlînê bike û çêlikên tûtiyê biperçiqîne. Wê çaxê tûtî xwe li sînga fîl dixe û dibêje:

– Kekê fîl ez di bextê de, çêlekên min guneh in, li ber firê ne. Wan neperçiqîne, tu çi dixwazî ez li ber te amade me. Fîl dibêje:

– Rebenê, evdelê ez fîl im, tu jî tûtî yî. Tu kî yî ku li ber min radibî. Ma çi hêviya min wê ji te hebe?!

Piştî van gotinan, fîl pê li hêlîna tûtiyê dike û çêlikên tûtiyê diperçiqîne. Li dijî fîl tiştek ji destê tûtiyê nayê. Dike gazî difire. Diçe cem qijakê, derdê xwe ji wê re dibêje:

–Fîlek heye rojekê pê li hêlîna min kir, çêlikên min perçiqandin. Min ji xwe re hêlîneke nû çêkir, çêlikên nû derxistin, lê hesreta wan çêlikên min ji dilê min dernayê.

Qijak dibêje:

–Ya xwişka tûtî ka ez ji bo te karim çi bikim. Ez qijak û ew jî fîl e, qet aqilê te vî karî dibirê, ez dikarim çi bi fîl bikim."

Tûtî jê re dibêje:

– Va ye bû êvar, fîl nikare mexel bibe. Dema wî pişta xwe da latê tû jî here xwe li ser serê wî deyne û her çavekî wî nikulekî lêxe, wî kor bike, bes e.

Qijak daxwaza tûtiyê tîne cih, fîl kor dibe. Lê belê ew jiyana xwe dîsa jî berdewam dike, ji ber vê yekê dilê tûtiyê hîn li wî rihet nebûbû.

Rojekê tûtî dinêre ku beqek li ser latekî sekiniye û dike qurequr. Tûtî diçe ber siya kevirekî û ji beqê re dibêje:

– Birayê beq ji min kirî ku tu di bin avê de yî, lê min bala xwe xurt da te ku tu li ser kevirekî yî. Çawa ku te ez xapandim, tu dikarî fîl jî bixapînî. Heke tu alîkariyeke min bikî evê bibe qenciyeke mezin ji bo min.

Beq dibêje:

– Ka bêje ez dikarim çi bikim, xwişka tûtî.

Tûtî:

–Were di binê latê de bike qurequr. Dema dengê te biçe wî ewê bibêje ka av heye, xwe ji latê wer bike, bigindire û bimire. Wê çaxê wê heyfa min jê bê hilanîn. Beq bi ya tûtî dike, dike qurequr. Fîl xwe li dengê wê digire, ji latê dikeve û dimire.

Tûtî bang li teyran dike:

–Werin goştê tolê bixwin.

**Gotindar:**
**MELE EVDIREHMANÊ TIZYANÎ**

**Berhevkar:**
**SALIHÊ KEVIRBIRÎ**



# Ez rast nehatime ku merivek wekî min bikaribe zimané kurdî di hevokan da rast xebitandibe

**Ev name ji aliyê Abdullah Varlı ve li hemberî rexneyên ku me li wergera wî ya Quranê kiribû, hatiye nivîsandin. Wî xwest ku em destê xwe nedine nivîsa wî û li gorî rêzikên Welatê Me rast nekin. Me jî destê xwe neda nivîsa wî û em wê diweşînin, bes bi wî şertî ku ji niha pê ve ne ew ne jî kesekî din nivîseke li gorî qeydeyên xwe nivîsandî, ji me re neşînin. Em nirxandina nivîsê jî, ji xwendevanên xwe re dihêlin.**

Hevalé héca û bira é beréz Zana FARQÎNÎ:

Biraé berézé delal! di cara yekem da ji bona péşewazîya ku we bi min ra kirîye û daye weşandiné ez pur sipas dikim û xaşî û ser bilindî û péşva çûnî ji bona we û rojnama we ra di xazim.

Heval!min ji bona we ra dîyarkir ku ez di waré ziman zaniné da dozdar nînim û béjim"ez bi zimané kurdî rind dizanim." Wusa jî min ji bona we ra got; ez dozdarim ku ez zimané kurdî di hevokan da rindtir di zanim bixebitînim.Heya roya meye niha héj ez rast nehatime ku merivek wekî min bikaribe zimané kurdî di hevokan da rast xebitandibe.

Hevalé héca! ez amedeyé wan kesne ku di arşé peyvne Qurané da rexnan ji min ra bişînin.Evan rexnene we ji rexné péştir kumreşîya weye ez dibînim.Loma hûn di waré ferhenga kurdî da pur kémin û kémasîne we purun,hûn navînin.Min di wé péşewazîya we da ku we weşandîye sed û péncî du ğelet dîtin.Bi vî ra jî dîsa ez ji we pur sipazî dikim. Loma baré li ser milé we pur girane herkes nikare hilgire.Ezé di vira da şérgekî çé bikim ku hûn bi xweber jî bi ğeletîyé xwe bizanin.

| ĞELETÎ | RASTÎ |
|---|---|
| Rojî da | Royî da |
| Li xwendi | Ji xwendi |
| Qur'an | Quran |
| Feqî | Suxte |
| Dersan dibîne | Dersan dixûne |
| Li başûré | Di başûré |
| Di medreseya | Di medresa |
| Li Erdîşé | Di Erdîşé |
| Li vî bajarî | Di vî bajarî |
| Li kurdî | Bi kurdî |
| Çap kirin | Çapkirîye |
| Weşandin | Weşandîye; |

wekî van heya 152 ğelet hene û parzûkirina we da jî héj purtir hene.Qe em evan nabînin û çiqas ji desté me bé em helanan didine we ji bona péşve çûna we em arîkarin.

Heval! em werne waré rexnene we.Min tîpne tirkî di wan peyvne tirkîne ku welgerandina wan li bal zimané kurdî nekirîye da xebitandîye.Heke hûn rind méze bikin hûné rastiya wan bibînin.Peyva Qur'an di zimané tirkîda bi vî cureyî té nivîsandin.Heke wusa nebe,di nîveka kuran û Kur'ané da tu raqetandin namîne.Lé kurdî wusa nîne,qe tu tékilkirina bi peyvé diné çénabe.

Heval!tîpa (é)ça nîşane ji bona méyatîyé wusa jî di zarewé mamedyan da nîşana dûmkirinéye û eva di wan zarewé Behdîné diné da tuneye. Wekî:Xurek xarin; gava léker bibe nav ewa bi seré xwe té xebaté.Retkoka (İsm mesder)bi yekatî té xebaté.Xurek hatiye xariné.Eva hatîye xurek xariné.Di zarevé mayî da xarin bi tené té gotin.Hecwekîyeke mayî: Dayîn ji wan ra hatîye dayîné.Dayîn ji wan ra di hate kiriné:Eva temtéla hané bi tené di zarewé kurdne mamedî da heye;di wan zarewé mayî da qe tuneye.Ji ber ku min eva tîpa(é)xebitandiye ji we weré eva ğelete.

Hevalno!heke hûn rind li ser Qurané bi ponijin hûné rasté rastîyé werin û hûné bi zanin ku min eva di çi warî da hûnandîye.Gava min dest avîte welgerandiné,héj di kurdustané da ji péştiré medresan di tu cîhîda nivîsandina kurdî tunebû.Gelo hûn di ponijin tîpne erebî di wan gavan da çiqas rewacbûn?Ji ber vîqasî evan tîpne hané hatine hilbijartiné.Yek jî Quran bi herdu tîpan ku were serhev 1290 rûpel dike,di hevqas nivîsandiné da divé ku ğeletî té da hebin.Ez bawer dikim heke rind bé mézekiriné,ewan ğeletîne ku arşé Qurané bi guhurin téda nabînin.Şixa evan ğeletîne hanénan wé di cara duduyan da kém bibin û wé di cara sisyan da pur kém bibin.Lé qe bi tu awayé bi gişţî ğeletayé nayé rakiné,Loma em merivin,çarastî aferişîye wusa jî ğeletî aferişîye.

Heval!ez bawer dikim ku gazîkirina heval Mezher GÜNBAT jî ne di şopa xwedane.Loma em dibînin ku Enstîtoya Kurdî çend sale hatîye avakirin û ça dimeşe û çend xebat kirine.Ez li bal xwe evé wekî Melé(Teyr) bi nav Enğer(Devekuşu)dibînim nav heye bi xweber tuneye.Mezobutamya Kültür Merkezî tiştek kirîye.Loma liber çavane.Ez rewşa we rind dizanim û dibînim.Heke evan waré hanénan nebûnan min dikarya ji wan ra bi gota jî péştiré gotegotan qe tu tişt nehatîye kiriné,lé baré we zore.Ez babawer dikim ku heval Mezher di gotina xwe da çewte û wekî kewane ji ber néçîrvan direve,bi tené seré xwe vedişére.Heval Mezher bi rûmeta xwe evan gefé xwe hilde bixe berîka xwe.Di nivîsandina te bi xweberda jî 21 yek ğelet hene,ku bi seré xw e jî du prağrafin.

Li bal min di vî warî da bira nivîsandin béne kiriné,çi dibe bira bibe.Loma wé royekî bé guhurandin û rastkiriné.Hûn di zanin eva bû çend sedsal ku zimané Ereban ji péştiré Ereban jî bi Ereban va li ser xebat heye,héj jî kémasîne wî bi hemîtî ranebûne.Xazîka gazî kirina we bé gefbûya.Ez bi xweber evan gefan ji xortayé hatîye di bînim û we di bağişînim.Heval!Ez dikarim arîkarya we di hinek tiştan da bikim,lé hûn nikarin qe di tu warî da arîkarya min bikin.Loma hewcene min di waré we da tuneye

Hevalno!Komalé Kurd wekî wan komalne cihané nû nînin,ku héj ji bona wan ra tîpne nû béne aferandiné.Komalé Kurd di berya İslamîyeté da xuyane û veşartî nînin.Lé di gavé Misilmanîyé vir da hatine veşartiné. Di

www.arsivakurdi.org

# JI WELATÊ ME



MAZHAR GÜNBAT

## Giyana têkoşînê

Rojên li pêşiyê me germ xuya dikin. Germa li Kurdistanê tîna xwe dide metropolên Tirkiyeyê û wan deran jî dikelijîne. Bi milyonan kurdên ku ji ber zilm û zorê dev ji warê bav û kalên berdane û hatine Stenbolê, çi alewî çi sunî, ne mumkûn e ku karibin di şertên wekî yên Stenbol, Enqere, Edene, Mersin ûhwd de jiyaneke rihet derbas bikin.

Sala çûyî, Newroz qasî salên 1993 û 1994'an bi gur û geş derbas nebû li metropolan. Wisa dixuye û tê hêvîkirin ku wê îsal li bajarên Tirkiyeyê Newroz ji sala çûyî gurtir bibe.

Agirê wê cejna pîroz bi rojan wê pêketî bimîne, ta ku bi milyonanan mêjiyên tarî bi giyana xwe ronî bike.

Ma wê kurd ji çi bitirsin? Welatê me di bin piyên dagirkeran de dinale. Ma ne ew dagirker in ku şertên dagirkeriyê jî nayînin cih? Dema kurd bi destê wan nakevin, dar û ber, pez û dewarên wan dişewitinîn. Kurdên ku ji ber zilmê hatine metropolan, ji ber wan sedeman jixwe her tiştê xwe winda kirine. Tenê tiştek di destê wan de maye, ew jî giyana têkoşînê ye. Ev giyan di vê Newrozê de wê serî hilde û wan rojên serhildanan bi bîr bîne. Newroza me ya 1995'an bila bibe destpêka xweş û geşiyê.

Divê ez li ser anketên Welatê Me jî çend tiştan bibêjim. Anket hê jî tên, lê kêm. Emê hefteya li pêşiya me, li ser vê mijarê agahiyên dorfireh bidin.

Daxwazeke me ji xwendevanan heye;

Xwendevanên hêja, hûn jî baş dizanin ku serkeftina me bi saya piştgirî û alîkariya we ye. Bi taybetî jî di berhevkirina gotin, biwêj, çîrok, metelok û hwd. de. Heta îro rola xwendevanên me pir xuya ye. Niha jî daxwaza me ji ev e ku hûn pêkenok, henekok û metelokên ku zêde ne dirêj in berhev bikin û ji me re bişînin. Ez bawer im ku eger li ser wan bête rawestîn û bên berhevkirin wê bi cildan tiştên wisa bên komkirin. Ji ber ku tenê pêkenokên ku li gundê Apê Musa dihatin gotin dikarin kitêbekê dagirin. Bêguman, hê jî bi sedan gundên Kurdistanê yên mîna Stilîlê û Zivingê hene. Em dixwazin ji hemû hêlên Kurdistanê pêkenokan berhevbikin û di rojnameyê de biweşînin. Emê li benda pêkenok û metelokên gund û navçeyên we bin.

**WELATÊ ME**

Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
**Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
**Metin AKSOY**

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
**Suut KILIÇ**

Redaktor
**Sami TAN**

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL-FAX**
249 13 44 – 245 29 91

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye–** Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin–** Silêman Sido
49-30-69 00 26 95
**Bonn–** Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
**Hannover–** Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg–** A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen–** Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg–**
A. Rahim Ayaz
49-75453258
**Swed–** Amed Tigris
46-8-740 69 81
**Amsterdam–** Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Paris–** M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atina–** Sîrwan Reşîd
Bekir Bahoz
30-1-3634905

seré Îslamîyeté da heya gavé Sultan Yawuz da 58 dugel hûnandine û diravé xwe çap kirine û di biné ala xwe da çûne ceng û qirînan û sînoré wan xuyabûye.Di gavé Sultan Yavuz da jî 25 dugelé wan hebûye û ewan bi Sultan ra peymané aştîyé danîne û tivék(itifak) çékirine.Di sala 1833–1838 da evan dugelan bi cengeke pur bi xûn va ketine desté Sultanan.Evan qirînan di dîroké da bi nav û dengin.Heya Sultanan ji Almanya general û leşker anîne.yek ji wan jî Moltké bi xweber e.Di Îrané da jî Dugelé Sefewî û Zendî dugelne Kurd bûn.Eyîbîyan çiqas Kurd bûne evan jî hewqas û héj jî purtir.

Ji ber vî qasî ez bawer dikim ku Kurd hewceyé tîpne nû nînin.Lé hewcene ku ewan tîpne xwene kevin bi van tîpne latînî bi guhurun.

Ez geryam gelo tipa(ğ) di çi zimanî da heye,min ewa di zimané tirkî da nedît.Eva tîpa nîşane heke peyveke ku eva tîpa té da hebe ewa peyva tirkî nîne.Îja hûn ça doz dikin ku eva tîpa tirkîye.Ez bi xweber ji vé doza we behitîm.Eva tîpa di wan nîvîsandiné Kurdîne kevin da ku ji wan ra sûretî hatîye gotin heye.Nîşana wé evaye. [illegible] .Di tîpne sir da ku jı wan ra naha tîpne Èzdî dibéjin da heye,eva nîşana wéye.N.Di tîpne pehlewî da heye nîşana wé evaye. [illegible] . Di Awestaé da evaye. [illegible] .Di Mixî da evaye [illegible] Di suryanî û erebî da wekî hevin ع .Ji ber ku di tîpne Fransawî da tunebûne mamoste Bedirxan nexebitandîye,nabé ku hemî Kurd jî nexebitînin.Şixa evan lé kolînan û purtûk li bal mamoste tunebûn,ku li wan méze bike rastîyé bibîne.Gava mamoste evan tîpan hûnandine,min nivîsandiné wané wé gavé dîtîye heke hûn ewan bibînin şixa hûné bi xweber sodret bibin û hûné béjin gelo evan di çiwarî da hatine guhurandiné bi van tîpne nû gehîjtine me.Eva tîpa şixa di daqtîloyan da heye,dibé ku em ewé bi xebitînin ku arşé peyvan ğeletnekin.

Hevalno!gava Kurdan temedun kirine,tîpne xwe jî aferandine.Di vî warî da komalne bîyané Kurdan hewceyî Kurdan bûne,Kurd hewcé wanan nebûne. Ji ber ku we nedîtîye hûn nikarin béjin tuneye ya jî wulo nîne.Divé ku hûn li wan bigerin bibînin ya jî bipirsin.Ça Kurdan tîpne xwe aferendine wusa jî peyvne béjewî şaristanî aferandine,îdî hewcé bîyanan nebûne. Wekî:Hükümet=Dugel. Cumhürîyet=Komar. Dad=Aalet. Maf=Hak û mayîne wekî van. Gomş=Kom. Gund=Dehé. Nûçe=Nehya. Bajar=Kaza. Şar=Şehir, Kend.Komal evan xebitandine loma li wan nav danîne.Di nava Eşîran da (Koçeran)da jî navne curecure li war û wargehé xwe kirine;ji ber ku xebitandine.Wekî Zom=Cîhé berevkiriné. Zozan=ji bona hemişk wargehî ra gotine.Aran,gava payîzé ji zozanan vedigerin zivistgeha xwe ra nav danîne.Ji van té zanîné ku Kurdan di waré binecîhîtîyé da û di waré Eşîrîyé da jî ji bona hemî hewcene xwe ra nav danîne.

Ji ber ku we eva tîpa dîtîye di nava tîpne mamosteyé beré da tuneye îdî hûn evan rexnan ji ber xwe va tînin,wekî wan merive ku şîr vexarine devé wan şewitîye,îdî çi tişta spî dibînin puf dikin,hûn jî wusa nekin.Hinekî bi firetî raman bikin û dûr bibînin.

Sergeftin û berxudarî ji bona we û ser ɑugûnî û çavgirî ji bona dexesé werabe.

Selam ji bona arîkaré belengaz bindestarabe.

ABDULLAH VARLI

## FERHENGOK

**Aramî:** Hizûr, îstîkrar
**Azirîn:** Ji ber êşê eciz bûn
**Derfet:** Pêkan, îmkan
**Katjimar:** Demhejmar, seat
**Kesayetî:** Şexsiyet
**Laye:** Alî, hêl
**Mexel:** Razana heywanan
**Nependî:** Veşarî
**Pêwendî:**Têkilî, eleqe
**Tawanbar:** Sûcbar (sanık)
**Tawandar:** Sûcdar, xwedî sûc
**Temen:** Jiye, emir
**Tenduristî:** Sihet (sağlık)
**Wer:** Wisa, wilo
**Wişe:** Peyv, bêje, gotin, şor
**Zexel:** Tiral, tembel
**Zexim:** Pihêt, şidandî

## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me Divê**

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 400.000 TL | ☐ 35 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 800.000 TL | ☐ 70 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.600.000 TL | ☐ 140 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê –** Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

**Li Derve –** Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ..............................
**NAVNÎŞAN** : ..............................
..............................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 2491344 – 245 29 91

LI SER REWŞA JINÊN KURD Û CEJNA NEWROZÊ BI DAYIKEKE KURD RE SOHBETEK

# 'ZAROKÊN ME TERORÎST BIN EM TERORÎSTÊ MEZIN IN!'



**Rastiyeke me heye, gava zarokên me di tevgerê de cih bigirin ji bo zarokên xwe be jî emê alîkariyê bidin tevgerê. Dilê me ji bo zarokên me dişewite, lê em ji bîr nekin ku zarokên bi hezaran dayikan ji bo welatê xwe, xwe didin kuştin. Dewlet, zarokên me dikuje û dibêje: "Ew terorîst in! Ku zarokên me terorîst bin, em terorîstên mezin in."**

**Hûn dikarin xwe bi me bidin naskirin û sebebê derketina xwe yê ji welat bibêjin ?**

– Ez ji gundekî Nisêbînê me. Dema cerdevanî derket ji bo ku bi me bidin qebûlkirin gelek caran hatin gundê me. Lê, me cerdevanî qebûl nekir. Piştî ku me cerdevanî qebûl nekir, her deh–panzdeh rojan careke leşkeran bi ser gund ve digirtin û em li meydana gund dicivandin. Ji şeveqê heta êvarê li ber berf û baran û sermayê em dihiştin. Gava êvarê em biçûna mala xwe me zad û xwarinên xwe tekilihev didîtin. Êdî leşker her roj her roj bi ser gund ve digirtin û li me zilm dikirin. Lawo, leşkeran gava li me didan digotin "Dağ başine taş geliyor, kurd başine komando geliyor." Ji ber zilma cerdevaniyê me ji gundê xwe koç kir û em derketin xerîbiyê.

**Dayê, îro li Tirkiyeyê herkes li ser pirsgirêka kurdan û çareserkirina wê hin tiştan dibêje, tu çi difikirî wê kurd mafên xwe bistînin an na ?**

– Wele, li gorî aqilê min, li gorî fikira min, emê heqê xwe bistînin. Êdî serhildan rabûne, berxwedanan dest pê kirine û serokê gelê me jî heye.

**Li gorî te jinên kurdan îro divê çi bikin ?**

– Li gorî min, gerek e jinê kurdan di xebatê de cih bigirin. Pêşiyên me çî gotine? " Şêr şêr e çi jin e çi mir e." Divê em jin li her der û di her warî de xwe bigihînin mêran. Di meşan de, di mitingan de, li çiyan û bajaran divê em xwe bigihînin wan.

**Der heqê Leyla Zanayê de tê ji me re çi bibêjî ?**

Divê em jinên kurdan tev Leyla Zanayê ji xwe re wekî mînakekê bibînin û li ser şopa wê herin. Leyla, namûsa me ye.

Leyla Zana nûnera jinên kurd e. Dewletê Leyla Zana û hevalên wê girtin û xistine hepsê. 15 sal ceza dan wan. Lê gerek e ew nehatibûna girtin. Ji ber ku ew mebûsê me ne. Girtina wan zilm e, zilma dewletê ye û em girtina wan qebûl nakin. Divê ew werin berdan û mebûsiya wan bidome.


**Ji dayikê kurdan re gotineke te heye ?**

– Divê jin û dayikên kurdan li her aliyê jiyanê cihê xwe bigirin. Di civînan de, di meşan de, di serhildanan de...di her warî de. Tiştekî din jî, gerek e her dayik bikaribe lawekî xwe ji tevgera azadiyê re bişîne. Rastiyeke me heye, gava zarokên me di tevgerê de cih bigirin ji bo zarokên xwe be jî emê alîkariyê bidin tevgerê. Dilê me ji bo zarokên me dişewite, lê em ji bîr nekin ku zarokên bi hezaran dayikan ji bo welatê xwe, xwe didin kuştin. Dewlet, zarokên me dikuje û dibêje: "Ew teroristin !" Ku zaroyên me terorist bin, em teroristên mezin in.

**Newroz li pêş me ye ji bo Newrozê gotineke te heye ?**

– Erê, divê jinên kurd di Newrozê de li pêşiya mêran bin. Li her derê, li gund, li bajêr, li deşt û çiyan agir vêxin. Di cejnê de, di pîrozahiyê de, di govendê de cihê xwe bigire. Ez, bang li jinên kurd dikim, "divê em di her warî de bikevin pêşiya mêran û di şer de cihê xwe bigirin."

**HEVPEYVÎN: ÎSMET ÛSIF**



Helbesta bi nav û denga helbestvanê nemir Pîremêrd, ku ji bo cejna me ya neteweyî nivîsandiye vê helbestê heya roja îroyîn li başûra welêt weke sirûda neteweyî ji aliyê her kes, grûb û partiyek tê qebûlkirin.

## NEWROZ

Em rojî salî taze ye, Newroz e, hatewe
Cejnêkî konî kurd e, be xoşî û be hatewe

Çend sal gûlî hîway ême pê pest bû, takû par
Her xwenî lawekan bû, gûlî alî nêw behar

Ew reng e sure bû ke le asoy bilindî kurd
Mijdey beyanî bo gelî dûr û nizîk ebird

Newroz bû agirekî wehay xiste cergewe
Lawan be işq eçûn be berew pîrî mergewe

Ewa roj helat, le bendenî berzî welatewe
Xwênî şehîd e, rengî şefeq şewiq edatewe

Ta êste rûy nedawe le tarîxî mîleta
Qelxanî gûle sîngî kiçan bê le helmeta

Pêy nawê bo şehîdî weten şîwen û girîn
Namrin, ewane wa le dilî mîlet a ejîn.

